

TIRÊJ

KOVARA ÇANDI Û PIŞEYI

Hejmar:1 Sal:1979


VEXWENDIN / Serxas ARDA
HELBESTÊN ROJEN BARNAS:

- Ez Mendaleki Çar Salime, Mamo!
- Melayê Şiretkir
- Jindari
- Bibişire

KUDA DIÇIN? (Çirok) / M.ŞEFİQ
CAR ZANE, ZER ZANE, ZOR ZANE
(Çirok) / Feridûn SALAR

HELBESTÊN MEM RONGA
JI NAZIM DU HELBEST
ESTANEKA MÊŞNA
(Çirok) / Sabahattin ALI
ZARGOTIN
FERHENGOK

www.arsivakurd.com



TİRÉJ

KOVARA ÇANDI Ü PİŞEYİ

Hejmar:1

Sal:1979

têxistîni

RABER KIRINI	3
VEXWENDIN / Serxas ARDA	7
TE VÎ ZMANÎ JI KU DERE ANÎ? (Serbûriyek) / Flit TOTANÎ ...	9
HELBESTÊN ROJEN BARNAS :	
● Ez Mendaleki Çar Salime, Mamo!	15
● Melayê Şiretkır	17
● Jindari	20
● Bibîşire	21
KUDA DIÇIN? (Çirok) / M. ŞEŞİQ	23
CAR ZANE, ZÊR ZANE, ZOR ZANE (Çirok) / Feridûn SALAR ...	27
HELBESTÊN MEM RONGA :	
● Bihar Pêşiyê Tê Li Helbesten	34
● Deriname	35
Ji NAZIM DU HELBEST :	
● Ayê	36
● Strenên Me	38
ESTANEKA MÊŞNA (Çirok) / Sabahattin ALÎ	39
ZARGOTIN :	
● ŞİRETÊ KALÎ (Çiroko Geli)	43
● ŞERÊ XALITA (Stranek Ji Wêşeya Gelêri)	46
● LAWIJ	47
● ZAZAKÎ DIR VATEY VERİNAM	49
FERHENGOK :	
● KURDÎ - TIRKÎ	52
● ZAZAKÎ (Dımılı) - TIRKÎ	56

Sahibi : Enver YÜZEN / Mesul Müdür : Ahmet Bozgil / İdare Merkezi : 850.
Sok. No : 51/A 3. Beyler Kemeraltı - İZMİR / Dizgi : Evren Matbaası / Baskı :
Doğan Basımevi / Fiyatı : 50 TL. Yurtdışı iki katıdır.

www.arsivakurd.com

RABER KIRINİ

Xwendevanên Beréz,

Her netewe, gel heta eşirek jindar, li dinê; xwedi zman, zar-gotın (folklor), wêje (edebiyat), bî kurtayi xwedi çandeki ye. Û disa ev netewe, gel û eşirên ha hîlberiyên çandeyên xwe, bî nîvisani dî nav xwe de belav dikin, raçîgihînin gel û neteweyên din, yên li ser rîwê dinê.

Azinên (metod) belavekirinê, dî her derbasok û gehinekê dirokê de cur bî cur, celeb bî celeb in. Geh bî dengbêji, geh bî nîvisani -bî rojname, kovar û pirtûk- û herweki dî heymana me de tê ditin bî radyo û televizyonê hîlberiyên çandeyi hatiye belavekirin, bî belavekirinê re hatiye pêşvebirin, lê zêdekirin.

Dî nav van navginên (wasî-tên) belavekirinê de é yêmayî (kalıcı) û ajobêna (süregen), yê nîvisani ye.

Nîvisaniya me i piştî İslamî-yê, jî sedsaleya deh-yanzdem destpêdike: bî Eliyê Heriri, Melayê Cezerî, Feqehê Teyran... û.h.w.d.

Wendoxê erjaye,

Dina dî hergu netewe (millet), gel (xelq) heta hergu eşiri wayirê zîwani, folklori, wêje (edebiyat)î, kîrra qalî wayirê çandê (kultur)î ya. Fîna ay netewey, geli û eşiri çandeyê xwî bî nuştîş, xwî mîyan dî vila kenê, resnenê netewanê binanê kî riyê dina sero yê.

Metodê vila kerdişî, wir vêr û demê diroki (tarix) dî tewir bî tewir i. Ge pey dengbêjan, ge pey nuştîşî -bî rojname (qezete), Kovar (dêrgî) û pirtûk (kîtab)-ow sekî çaxê ma dî haseno pey radyo û televizyon hîna weş vila biyê.

Mîyanê nê wasîtanê vila kerdişî dî mendox û domdar adê nuşte i.

Bîsilmaneyey ra naştî nuşteyê ma seserra des-yewendesîni ra dest bîder keno: Bî Eliyê Heriri, Melayê Cîziri, Feqiyê Teyran ow ay bîni.

Peymande (miras) yê ma o folklori, peymendeyê ma é nuştîşî ra vişêr û herayêr o. La çî

Jêmayeya me î zargotîni, jî jêmayeya me î nivîsani balûpal û rengintir e. Lê mixabin, ku em jî niha ve lê xwedi der ne kevin, berhev û biserûber ne kîn, roj bî roj wê wînda bibe, bihele. Em dê mîna zîlamên naçakê miratxwîr destê xwe bîdîn ber rîwê xwe û ax li min bavo kîn.

Xwendevanên Berêz,

Va em; bî pêşbira lêxwedîderketîna çandeya me î jêmayeyên kevnare (klasik) û gelêrî, derdikevin. Dî alîkî de vê jêmayeyê xwedi kirin, parastin; dî aliyê din de lêzêdekînan û pêşvebirin. Ev diviyahîyek çavêkî û berpirsiyariyek dirokiya ku xwe bî dijwari dîdîn pêjnandin.

Bî vê derketinê, berpirsiyariya xwe ya arîzî ya diroki bî cih tinin û heta hoyên (sertên) me dest bîdîn, em dê li berpirsiyariya xwedi ha xwedi derkevin. Lê jî derketîna hejmarê pêşîn pê de, hinek berpirsiyariyên girîngtir he ne ku, ev jî yê wê xwendevanên berêz in.

Pardariya wê î girîngtir çî ne?

Bî kurtayî ev in, xwendevanên berêz!

1. Ne ku hun tîqûtenê hejmarê kovarê bîkîrin, bo hemberiya hemberan. Lê jî rêza rûpela pêşîn heta rêza rûpela dawîn, bî hedan, bî çavê tîgîhiştîni û lê rexnegiriyê bîxweynin. Dibe ku bî xwendîna Kurdi-jî ber genc ne hinbûyîni- dî destpêkê

fayde kî, ma nîka ra pey wayîr nê vejîm, arê nêkerim ow sere-rast nêkerim se, roj bî roj vîndî beno, vilêşêno. Ma bedî zey mîrdîmanê nebaşanê miraswêran vanim «ax li minê bavo» ma dest ra vejîna.

Wendoxê erjaye,

Ma semedê wayîrî kerdişê peymendeyê çandeyê klasik û gelêriyê xwî vejîyênim. Kîştî ra nî peymendî rî wayîrî kerdiş, pawîtiş, kîştî bî ra zî vêşî kerdiş û aver berdiş. Na lazîmeya cematkî û yew berpirsiyarî (mesûletey) ya dirokiya ku zorkanî xwî dana eşpawîtiş.

Bî nî vejîyayîşî, berpirsiyariya xwîna arîzî ya diroki ma anîm ca û heyana kî ma dest ra bêro ma ku na berpirsiyariya xwîrê wayîr vejîm. Labrê vejîyayîşê ûmar (hejmar) a verên ra pey, tayî berpirsiyariyê hîna girîngî (muhim) estê kî ê zî ey şîma wendoxanê erjayanê.

Pardariyê şîmayê en girîngî çîna yê?

Kîrî reydi nê yî, wendoxê erjaye!

1 — Erinayîşê ûmara kovarî tîkûtena nê, Labrê xêza rîper-rê vernî ra heyane xêza rîperrê peynî, bî sebr, bî fahmkerdiş û bî rexnegîrî (kritikî) bîwanê. Beno kî vernî dî wendîşê Kirdkî-semedê weş nê musayîşî-serey tay wendoxanê mayê erjayan bîdejno (bitewno). Hewna (rayna) lazîmo kî enî embazî qerarî reydi, rîkkî reydi wendîşê xwînê

de serê hinek xwendevanên me i berêz bêşê. Disa ji divê ev hevalin di hedar (qerar), bi rikoyi (inatkarî) xwendina xwe i Kurdi, bo pêşvebirinê her û her bi cadinin, bîdominin.

Tika (reca) me ya pêşin û giring (muhim) ev e.

2. Piştî ku her hejmarek hat xwendin, bête bixwendin bi heval û hogirinên din ku, hejmarên kovarê ne ketine destê wan, an ji ên ku bi dest ne xistine. Û disa hevalên ku di xwendina Kurdi de têr û xurt in, dive alikariya wan hevalên qels, di xwendina Kurdi de bikin.

3. Divê, hevalên pêûsgir û hînermendên di warê niviskari û helbestkariyê de hilberiyên xwe ji me re bîhînerin. Hevalên wisa hene ku ji berê xwe ve hilberiyên zargotin (folklor) a Kurdi-herweki çirok, çîrvanok, metelok, tîştanok, kîlam, dilok, payizok, lawij, gotinên pêşiyaberhev kirine û hê ji berhev dikin. Hêviya me ji wan hevalên berêz ku nivîstek (nuxayek) ji wan berhev kiriyên xwe, ji me re bîşinin. Lewra ev gişt, çî ên afirandi, çî ên berhev kiri, hilberiyên çandeya netewê me ye.

4. Destpêkirin ji me, lê do- mandin bi we ye. Kîl û kêmasiyên me bê şik wê hebin, û gengaz (mumkin) e ku em lê ne warqilin. Lê, li wan kîl û kêmasiyan bi rexneyên xwe i hêja me hişyar kirin, berpirsiyariya we ye. Hûn dê van kîl û kêmasiyên

Kirdki tîmûtîm aver berê, down bikerê.

Tika (reca) ma ya verên û giringî na ya.

2 — Wendîşê hergu ûmar ra pey, bidê sowbi embazan wendîş. Ow gîlana (heyna) embazê kî wendîşê Kirdki di zanayeyi lazîmo ardîmê wendoxanê kemzanayan bikerê.

3 — Embazê kî destê inan pênus (qelem) tebişeno û warey niwiskarey (nuştoxey) û helbastvaney (şairey) di hînermendî lazîmo niwîştanê xwî mare raykerê. Embazî estê kî verîna tebayê (çiyê) folkloriyê Kirdki -sey çirok (hikaya), estanekî, metelok (fiqra), çibenok, derdo, deyr, dûrik, deyrê zerri, vateyverinan- pêser kerdi ow hima zi arêkeni. Hêviya ma eni embazanê erjayan ra na ya kî: yew (jew) nusxa niyan ra marê bi erşawê. Çimki niy heme, çî vîraştêy çî arêkerdey benê hilberiyê çandeyê neteweyê ma yê.

4 — Destpeykerdîş (Destpeykerdenî) ma ra, labrê ramîtîş pey bi şîma wo. Kemaney bê guman benê ow beno kî ma hîgidar nêbi. Bî rexneyanê xwinê erjayan eni kemaneyan ra hêşyar kerdîş berpirsiyariya şîma ya. Şîma eni kemaneyanê ma ca kerê, bi sebebânê xwî reydi marê bi erşawê (bîrîşê) şe ma zerweş (bextewar) benim.

Wendoxê erjayey,

Na yew kovara çandeyi ya. Her gama ya (ca) y qandê aver

me bîpêdînın (tesbit kın), dıgel egeriyên (gerekçên) wan jî me re bîşînın, em dê bextewar bîn.

Xwendevanên Berêz,

Ev kovareki çandeyi ye. Her pêgaveki wê xîzmet û xebat e, bo pêşveçûn û qelew bûyîna çandeya Kurdi, û bo zmanê nîvisanîyê.

Em rêpaniya alikariya we dîkîn, rêpaniya alikariya we î: bî xwendîn, bî nîvisandîn, bî belavekirîna dî nav geli û bî lîxwedi derketîni.

Bî gramên me.

şiyayîş û qelewbîyayîşê çandeyê Kirdki ow qandê zîwanê nuştîyê Kirdki Xîzmet û xebat a.

Ma pawîbê ardîmê şîma yim, ardîmâ şîma: bî wendîş, bî nuştîş, bî vîla kerdîşê mîyanê geli ow wayîr vejîyayîşî reydi.

Bî gîramî...

TÎRÊJ

TÎRÊJ

VEXWENDIN

Serxas ARDA

Bê şik mina her gel û neteweyên li dinê em ji xwedi çandeki ne. Zmanek, muzikek, zargotînek (folklor), wêjeki (edebiyat) me ji he ye. Weke her tîştî, her bûyeri ew ji hewcedarên xwey bûn û xwedi kirinê ne. Bî xwey bûn û xwedi kirinê pêş ve dîçin, dîçihijin, dîçimilîn.

Dî warê zman de, bê fikare em dîkarin bêjin ku: Kurdi, dî bersiv dana her dîvîyahiyên wêjehi, siyasi, abori û felsefi de têrkir û fereh e.

Dî warê zman de, bê fikare em dîkarin bêjin ku Kurdi, dî bersiv dana her dîvîyahiyên wêjehi, siyasi, abori û felsefi de têrkir û fereh e.

Kurdi dî raçandina bêje û lêkeran de zmaneki zayok e. Dî bêjezani de xurt û dewlemend e, nemaze dî bêjezaniya navdêrên kesdari (muşaxas) de.

Zmaneki bî xwedi kirin, dî her wari de bî bîkaraniyê bitir dibe, dîçihije. Zman ji tîşteke jindar e; bî xwarin, vexwarin, xwedi kirinê diji, bî fîltandina ji eş û jandariyên xwe i arizi bijûndar dibe.

Vejandina zmaneki; digel zmanê axaftini, bî pêşvebirina zmanekî nivisandiniyê ye, ku ev; zmanê weşandiniyê û wêjeyê ye. Drûvandini bivê, zman weke sindanê hesinkêr be, zmanê nivisani ji nola kerane û geran e. Sîndaneki ku demeke dîr û drêj ji mîzdana kerane û geran dîr keve çawa biçilmise, zenga kevnariyê û perpûta mirinê bavêje ser çavê wi, wisa ji zmaneki ku ji axaftiniyên rojane û bîkaraniyê nivisani dîr bimîne dîmerise, dîçurise, dîçilmise.

Hinek kes sedemên ne axaftina xwe i kurdi, bal bî têr ne kirina kurdi, bo serwest kirina daraz û daxwaziyên xwe ve grêdîdîn. Hin

jê ji bî nefspîçûkîyêk jî parsûstûrî, bî bersiveke hêsan xwe dîfîltînin:
«Em hatine xunîfandî (asimîle bûne).

Belê! «Nîzanîm, hêsanîya canîm.»

Bê şîk ev herdû bersiv jî, ne dî cîh de ne. Û jî bîni çewt in.

Sîyaset bo çare dîtî û bîşkaftîna gels (mîşkîl) û pîrsiyarên cîvaki tîn kîrîn. Rîyên bîşkaftîné bî zmanê wê cîvakê tîn gotî, tîn ragîhandî. Lê hîn jê jî van sîyasetgeranên me bî geli re ne bî zmanê wî, bî zmanêke dî dîvên bîaxîfî. Bî zmanê ferma.

Gengaz (mîmkî) e ku meriv dî bîn nîrê lî-xwe-xunîfandî (asimîlasyon) yê de, bî makezmanê xwe têr û tekûz nîkarîbe daxwaz û darazên xwe ragîhîne, yê pêşberê xwe serwest bîke. Ev dîbe ne jî akama (tesîra) lî-xwe-xunîfandîné be, lê jî ber devokên pêwari (lokal) be jî. Her jî çî sedemî dîbe bla bîbe, ma gelo dîvê ku em lî berê, destgrêdayî û stûxwar bîmînin. Bê şîk na! Dîvê em dest bavêjî vê pêvajoyê (sûreç), bî vênêk (îradeyek) xurt, xwe jî vê tralîyê daweshînin. Vatîni (vazîfe) ya me î mêjûyî (tarîhî) ev e.

Gelo em lîhêvîya çî ne, an kî ne...

Ku em bî zmanê xwe ne nîvîsînin, wêjeya xwe ya heyî ve ne jînin, zmanê xwe î nîvîsani fereh ne kî, pêşve ne bîn, wê kî bê vejîne, fereh ke, pêşve bîbe? Jî kîjan bejê (qîtayê), peleyê (ülke) wê kî bîn?

Ev vatîniya me ye. Em kî ne? Ez îm, tu î, ew e, karkêr e, xwendekar e, rewşenbîr e. Bî kurtayî em in.

Fermo! Werî em lî hêvîya we ne.

... Te Vi Zmani Jı Ku Dere Ani?

Filit TOTANI

Mêvaneki min he bû. Dıviya pê re biçim Dıyarbekrê. Her çiqas pê re çuyina min dı ali işê wi de, wê tu bikêri wi ne hata ji, lê disa ji bo qinyata dilê qi dıviya pê re biçim.

Me xatir xwest û em ji malê derketin. Zaroyan lı pey me avê rêtin, dilên me ket cih. Pişti av rêtinê ne ma êdi tifaq û teşqeले bèn serê me. Oxira me vedibû êdi. Ez bışirim. Mêvanê min, Mirxoyê Xano lı min ziviri: «Herê herê... bavê bavê min tu çıma dê ne keni, zani êdi pişti vê avrêjê tifaq û teşqeleyên lı pêş me pûç bûn.»

Bı axaftına Mirxo re dengê selavdaneke ji pişt me ve hat. Lı hındava dengi zivirim, Mele Mihemmed Eli...

— Rojbaş Mela! Çawani, qenci gelo?

— Hemdê bê hed bo rebbilalemin, exi. Dı intizara roja xwe de ne. Hema Xwedê ji imanê û qur'ana ezimuşşan mehrûm ne ke. Ev exiyê me ki yê?

Mirxo xwe ra ne girt. Gotê:

— Na bavo ez ne xi me, ez cibri me.

Min gotinê ji ber Mirxo hıani:

— Mêvanê min e.

— «Ya... Ser çavan. Gelo sıheta te çawa ne exiyê min?»

— Spas. Tu gazıneke min ni ne ji ali xweşıya min ve.

— «Elhemdülillah summê elhemdülillah. Rebbilalemin kesi neke bın darê sıhhetê. Rebi muinê te be. Zani exi bê teqdira qehhar, tu ziruh nıkare hereket bike. Enkebût daxi bı teqdira qadirê mutlaq

dikare bilive. Sanieki, hakimeki wisa ye ku bê misal e, layezal e, (bî zanyari bîşiri) maşaallah eqlê meriv nagihije hikmetê zulcelal.»

Mın gotina Mele biri:

— Belê Mele!

Mele dev ji axaftina xwe ber ne da:

— «Maşaallah li hikmetên zulcelal bînhêre kuro, çî qas hubba te di dilê mın de he ye. Fesuphanellah ji te qadiri re, ji xwe tu qadirê kulli eşyayi, lê wellahilezim bî qasi hubba te di dilê mın de ye, ew qas yê tu kesi di dilê kesi de tu ne. Xaricê imkan e. Rehm û xufrana xeffar, cenahê xwe ji ser serê te sayei hifza xwe mehrûm ne ke.»

— Ji te ji Mela.

Mele Mihemmed Eli qet dengê mın ne bir xwe. An ji ne dixwest «tekelluma» xwe bibire. Bê zordana xwe, bêjeyên (kelime) erebi, farisi yên belbi hê ruyê tavê ne ditibin ji tûrikê birpêbirina xwe derdixist mîna çavikên rêstina tentena bî hev vedikir, dirêst. Hız, rûmet, sıyanet tenê bî van bêjeyên bıyani (xerib) bihatina dazanın.

Lê malava de ka ev islamiyeti ye? De ka ji kitêbê şerietê re, tê gotin «pirtûkê şerietê». Kitêb kitêb e, pirtûk pirtûk e. Xwedê mûinê te be çawa ye, Xwedê alikarê te be çawa. Di mûinê, inayetê, muawenetê de hêzeki xwedayi he ye, veşari ye. Lê alikar?...

Em hatin serê sêriyana nav çarşiyê. Mın xatir ji Mele Mihemmed Eli xwest, ez û Mirxo ber bî rawestingeha minibusa verêbûn.

Çarşıya mezin ji boşahiya (izdiham) merivan seremişt bû. Ji çûnehatê mîna qula mûriştanê dikeliya.

Îsmet efendi di nav derê dikanê de li piya rawestabû, li çûnehata rê dimeyızand. Me selav li hev kir, Îsmet efendi destê xwe drêji mın kir, me bî destê hev girt, hejand. Îsmet efendi:

— «Bûyrın, çayeki me vexwê.»

— Gelek spas. Em rêwi ne, dîçin Diyarbekrê. Di me bîbüre.»

Îsmet efendi:

— «Allahaşqına, bûyrın efendi abêcixım çayeki me vexwe, disa tê heri.»

— Ne, li me helız e. Divê em pêki zûtır bıçın.

— «Temam, tamam efendım. Iııh navê wi çî ye ezê telefûn kım, ku teqsi rabûse bla bê we hilîne.»

— İca bû. Spas.

Em derbasi hundirê dikanê bûn. Îsmet efendi derbasi masa xwe bû, sandalyê nişani mın da, ez derbasi sandalyê bûm, li sandalyê rûniştım. Mirxo ji li ser kursi bî cih bû. Îsmet efendi li cama camekana dikanê xıst, lawikê çayger lê nihêri, Îsmet efendi bî tılıyan jê re îşaret kir, sê çay xwest. Drêji telefonê bû, rawesta, bî destek pakêta

cıxarê drêji me kır. Mın û Mirxo heryek jı me cıxareki jı pakêtê hılanı. Mirxo bı hestê xwe xwest cıxara İsmet efendi vêxe. İsmet efendi ne hışt. Gotê:

— «Efendım, ew duyê çakmaxê te jı sıheta insan ra zararlı ye.»
Û pê re hesteyê xwei gazê jend, cıxara xwe vêxıst. Telefon derket, İsmet efendi axaft:

— «Alo! Bay Nûri, ez İsmet efendi. Du yolcıyê mın he ne, teqsiyê Dıyarbekrê he ne, tu ne ne? Heta yarım seetê hımmm. Baş e efendım baş e. Tu du qoltix ayırımış ke, bışine ber filıpis (Philips) bayı. Bû canım. Haydê canım iyi gunler.»

Çayên me hatın. Çayger, çaya heryeki jı me da berê.

Mın jı efendi pırsı:

— Çawa danüstendına we çawa ye? Fırotına we dıbe, na be?

İsmet efendi lêvê xwe çılmısand, bı niv mirúzqusandını got:

— «Sayın abêcım, ê me emekeki lızumsuz e, em pê re dıbinın. Hiç yoqsa çar-pênc mılyon eşya dı hundır de he ye, lê satıř na be. Efendım insanê vi memleketi alıřmıřê sefaletê, pisitiyê bıye. İmkansız efendım imkansız e. Jı me re medeniyet lazım e. Mêrik ber pireka xwe na keve, yaxut bı pireka xwe inanmıř na be, ku çamařır makinesiki bıkıre, çamařırê malê pê yıqamıř ke. Mın sê muzik dolabi ani, řeř meh wısa lı dıkanê ma efendım. Yeki jê jandarma qomıtani kır, me yeki da doqtor, yek mabû ew jı rojek xanıma qeymeqam hat çavpêket, me da wê. Bay Selim ekmek aslanın axzıdadır, ekmek qazanc kırın guc bıye. Qazanca mın i rojê yırtmıř bike rojê jı bisti berjor na çe, lê êloxlı dı rojê de çarsed pênsed hezari qazanc dıkın. Mın jı bayıeki tanıř ra dırıma xwe řikayet kır lı İstenbolê, çı bêje begenmıř diki; got «qardařım çurumıř dıbi.» Gêrçekten jı em çurumıř dıbin lı vê derê. Sayın bay Selim, ticaret işeki qolay nine birê mın. Ellah wekilin olsun niha sed hezar alacaxê mın he ye dı nav xelqê de. Bavo kes çabûq çabûq nayne borcê xwe na de. Gere tu istek bıki ku hê bine. Du roj berê sed û pênci û çar hezar bonoyê mın hebû, mın çû jı yabancıya, jı esnafa borc stend û udemıř kır. Banqa Muduri rojek ertelemıř kır, lı mın beklemıř kır. Babam bû insaf degil.»

Teqsiki gewr lı ber dıkanê rawesta, lı qlaksonê xıst, řofêr bı işaretan bangi me kır. Ez û Mirxo rabûn. Mın bo çay û her tıřtı spasi İsmet efendi kır û xatır jê xwest. Mirxo jı bı destê wi re gırt, malavayi tê da.

Em jı dıkanê derketın, rêza pêřin jı me re hıřtıbûn. Mın derê pêřin vekır, ez û Mirxo derbasi cihê xwe bûn, bı cih bûn. Teqsi bı rê

ket. Me disa bî dest hejandîni xatır jî Îsmet efendi xwest.

Teqsiya me berbajarkê qesebê lî pey xwe hişt. Bî bezahîya xwe re babeliska xubarê jî axê hiltani. Ereben ku jî hember me dihatin mina berikên tîfîngê, bî vîzin dî me de dibîhîrin. Jî hafê ve me didit, lê dî lî hev derbas bûnê de bî qasi çav niqandîneke sıvîk jî hev dibîhîrin.

Rêvingiyek lî paş rûniştî, bî dengêk fetîsokî û bî borin jî ajoyê teqsiya me pîrsî:

— «Mîn tîştêkî bîhişt Felemez, êra rast e?»

Ajoyê me, dî neynîka paşvedînê de lê nihêrt:

— Çawa xalê Hacı?»

Hacı:

— «Kufareti guna be, dibêjûn te şevê dî tîfaq derbas kîriye.»

Ajo:

— «Xwedê ewladê te bîhêle, Xwedê te xwey ke. Welle te dî qeder e.»

Rêvingiyê kêleka Hacı ket nav axaftîne:

— «Êra kufaret be Felemezo, xêr be çî biye?»

Felemez:

— «Lo heyra tîştê awa tîm lî pêsiya me şofêran e. Gotînekê me şofêran he ye: şofêrin eceli yol, qarîsî dûldîr. We diye ku şofêreki dî nav cih û yataxê xwe de mîriye? Na ... Mîn bî xwe ne bîhistiye, ne ditîye jî. Jî xalê xwe î Hacı re bêjîm: Çûbûm Sêregê, mîn îşê xwe bitîrmîş kîr, gorîşmê xwe qedand, êdî donmîşî Diyarbekrê dibûm. Hatim ber terminalê, Ellahû alem a'îmsar gote mîn; «hîmîm dîçî, yolciyê mîn he ne bîdim te, bibe.» Mîn jî xwe ra got hîmîm dîçîm hîç olmasa vala ne çîm. Wele mîn yolciyê xwe bindîrmîş kîr û bî rê ketim. Em hatim dî qereqola Qerejdaxê de gêçmîş bûn, lî wê derê çend wiraj he ne, em jî birîncî wirajê gêçmîş bûn, lî îkîncî wirajê donmîş dibûn ku jî ûzaxê sîleh seslerî me dûymîş kîr. Sîlah seslerî çawa dihatim... Mîn basmîşê xazê kîr û son surat yola dewam. Ne olîr ne olmaz te dî kîm bîlîr belkî mehkûm bûn weya yolkesen bûn. Wele mîn da xazê. Erebe dî bîne me de ûçmîş dibe. Em yoqîşê tîrmanmîş bûn, derketim tepê, çî bîbînim; çar sed-pênsed metre pêşiyame qamyoneki megersem çarpîmîşê pezê koçera biye, pez sahiblerî jî bî tîfînga saldîrmîsê şofêrê qamyonê kîrîne. Mîn basmîşê frênê kîr, eyb e, eyb a ku frên tûtîmîş bîke tu ne. Mîn xazê kesmîş kîr, bereket vêrsîm lî saxê rê çaqîl hebûn. Wextê ku asphalt dokmîş kîrîne, lî ser asphaltê ev çaqîl baş sıqîşmîş ne biye, ereba îtmîşî kenarê cadê kîrîne.

Wele mın direksiyonê kirmişê saxê, doxridan doxriya çaqılın uzeri kır. Neysem Elah bin bereket vêrsın yawaş yawaş xıza mın kesilmış bû, mın vitêsê kuçultmiş kır, hatım nêziki wan dûrmış bîbim yolçiki mın go; basmişê xazê ke, van koçera dijminê me ne, zû me se, bilezine, gıdı zû. Mın erebê taqmişê ikinci vitêsê kır û suret dayê, û dewamli lı qornê xıst, disa ketım orta cadê. Dı orta rê de termê qoyıneki hebû wele mın lı ortê xıst û derbas bûm. Em ji wan gêçmiş bûn, mın yekcar sureta xwe zêde kır, birden çı bîbınım qurşunê tıfinga dı ser serê me de çawa ûçmiş dıbin. Dayê dêranê megersem wan dijminê xwe i dı erebê de tanımiş kırine, wele ji ecel qorqısı mın xız dayê.»

Felemezê ajoyê me, serpehatiya xwe ji niqtên heta bihnokê bı rê û zê dıkir dıgote me. Lı fetlanekê çawa ji rê derketine, çawa disa bı heft kul û heft belayı navgina xwe derxıstine ser rê û bı rê xıstıne, yek bı yek, mina bengeke (imajeke) sinemayê ji me venepeni dı ber çavê wi de derbas bibe dıgote me. Serpehatiya wi ya duhi gelek drêj, rengin bû. Dıgot, dıgot, dıgot paşı lê ne tani. Paşı lê aniné ne dıxwest jı.

Em lı Dıyarbekrê, lı Derê Çiyê peya bûn. Mın ji mêvanê xwe i Mirxo pırsi:

— Çawa rêwitiya te çawa derbas bû? Jê kêfxweş i?

Mirxo lı mın nihêrt:

— Rêwitiya mın xweş derbas bû. Lê Siloyê Sarê hat bira mın.

— Çawa?

— Tu zani, Siloyê Sarê gundiye me ye. Ji lejkeriyê ziviri, mina herkesi çûn bixêrhatına wi ji. Pırsa wi kırın, Silo bı tırkiyek nêr bersıva me dıda. Me dıgot «Silo lawo bixêr hati», Silo xwe pık dıkir dıgot «saxol», «ellerinden upmiş dıkım». Hımmm, me nihêri ku Silo xwe lı tırki datine. Mirzoyê Mısto jê pırsi: «Silo lawo, çawa gelo tu hini tırki bûy ne bûy?» Silo gotê: «Lê çawa ugrenmiş kırime.» Mirzo je pırsi: «Xwedê ki bı tırki ji kêça re çı dibêjn?» Silo da hişê xwe, bîbir nani, lê ne bû ku rastıya xwe bêje me. Mirzo pırsa xwe cari kır. Silo lê ziviri, gotê «Oooo! Xwedê jê razi tu çüyi pey tiştê hûrik keti.» Mirzo bışiri: «Bı xwedê ki ji hêştıra (deve) re bı tırki çı dıgotın?» Silo awire bı lejkeri da «Oooo! Xwedê jê razi, tu ji tiştê ew qas uskek sormış diki» Flitê Ferho ket nav axaftınê jê pırsi: «Êra bı tırki ji kera re çı dibêjn» Silo bı zanyari bışiri: «Bera hun cahıl mane oxıl, lı wi welati ji kera re êsek dibêjn» Flit: «Lê daşê wan re?» Silo da bira xwe bı bir nani. Bı kovan serê xwe hejand: «Wele bı piçûki toqınmiş wan ne dibûn heta buyumış dibûn, ku buyumış dibûn ji wan re ji dıgotın êsek» Pıxkin bı cıvatê ket, kışt kenin.

Dotira rojê me bihist ku Sîlo jî Sêva jina xwe re gotiye: «Sêvê Sêvê!. Êsek qızı êsek indır hevani getir o nani» Êêêê... Sêvê yeka mêrane ye, dibın gotına wi de, ma dımıne, wê jî gotiyê: «Hey la teres! Mın ri ser wi zmanı, te jî ku derê ani?»

— O... ê! Mirxo...?

— Ê û ê. Mele Mihemmed Eli, İsmet efendi û ajo Felemezê we dewsa Shiyê Sarê girtine.

— Lê tu, Mirxo?

— Hema ez jî Sêvê, de tu ne raziyi jî wan re bêje.

Ez mendaleki çar sali me, mamol
Dı sala mendalên dinê de
Ez mendaleki çar sali
Lı hewşê

pıtık lı ber dil

pıtık lı hambêz

laşeki

Laşeki pari bı pari

cenge cenge

ji bombên mêtîngêhkari

Ew laş,

Yê

Dayika

mın e.

Ez mendaleki çar sali me, mamol

Ez mendaleki çar sali

Ragihinin Dehakê virni İmam Xumeyni

Bêjne:

Te Mehabadê xopan kır,

lê

Lı ser kavilê

wê

mendaleki çar sali

Niha

bı ava kırına

Mehabadek nû

bli

Ez mendaleki çar sali me, mamol

Ez mendaleki çar sali

Ez, niha malokan çê dikim ji xwê re

Ezê ji malokan ava kım Mehabadê

Mehabadek ku:

Ji avahiyên xwêdana mın xemli.

Melayê Şiretkir

Seydayê delal!

Ê ku dî civatan da bî galegal

Û lî ber şireta pehn...

Me,

«Ad û Semûd» bîhistin,

Jî keştiya Nûh, ta xewarên şikeftan

Keftelefta Mûsa lî hember Fir'ewn

Qewmê Lût,

Û jî bîl çakûçê dî stuyê pût ve

Meteloka Harût û Marût.

Jî heft qorê dojeha bînerdi

Ta heft qorê bîhiştê lî esman...

Smail û Malik,

wek lî nîk

me bîn

Em, ew qas pê dîzanîn.

Bese êdî ev galegal,

qîlqîlin,

şiret

û gâzîn.

Bese qurban!

Dakîşe jî «Lamekan», were xwarê

Were dinê,

Qasek lî insan,

lî mirovan mêzeke, fermol!

Jı wan,
Jı me re minakıyan werine
Ku kedxuri,
Zordesti û sitemkari
Çıto tawan in.
Û çıto gunehkari ye seri xwar kırım,
Bı razi bûyına sitembariyê...

Mûsa û Harûn
Zarokên Imran,
 çawa filitandin mirovinan
Jı binê nîrê zordestiyê,
Û hınermendê xwedi gopal, jı bo wan
Çawa têkoşineke mezın i giran
Hilgirt ser milê xwe, û pêk ani
Û da pêşiya dilan
Wısa
Tu ji
Minakıyan bine jı me re
Minakıyan werine,
 yên bën fesalê
Yên ber bı hiş bın, yên ber bı mêji
Û bide pêşi
Fermo!

Qora me fere ye, lı ser rastiyê
Xebatkar in tê de seraser.
Tê de, ne Qarûn, ne Fir'ewn, ne Azer
Ne Ebrehe û Ebûsufyan...
Lı pozberê wan
Lı pozberê wan evên dı zeman
 em...

Bı berberi,
 em...
Bı birûbaweri,
 em...
Bı dilaweri,
 em...

Seydayê delal
Bı serê te i tacdar
Dê ev pergâl.

hılweşe

Eninivisina şarsaniyetê wer dibêje
Û wer dıvise dı rûpela defterê
Deftera bıyardana karkêran.

Wê bı geran

Bê şıkandın rêzıla dilitiyê

Vi diwarê ku

Jı niha ve terk lê ketiye

Dê bê herifandın, jı bini

Bindest wê bıfıltın,

jı nirê koletiyê

Wa

Lı dinê serapa

Gıhiştın hev

û yekbûn

Karkêrên hemi peleyan

û gel û netewên bindest

Lı hember

Dehak, Qarûn, Fir'ewn û Azer

—Yên dı heyman—

Seraser

Lej dıkın.

Xwediyên diravan

Û Neronên vırni

bı pégavan

vedıkışın

jı qada şeri.

Lı aliki belengaz û sitembar,

em...

Lı aliki kedxur û sitemkar,

ew...

Jı wan re, tu me be piştevan

Û jı «Lamekan»

dakışe,

were

Lingê xwe deyne ser axê

Bla lingê te ax bigire
Û binihêre.
Mina kurê Nûh, nola jina Lût
Ve ne qete jı hogıra.
Mela!
Keştiya me lı ser rabûnê ye
Lı pey helaka xwe me çe
Bızivire.

Jindari

Lı **kersaxa** evina te
Dıl, masiyek pırpitandi.
Bê derya evinê, kê dit
Jindariyê, kê hêçandi?

Bıbışire

Bıbışire
Evina mın,
Lı eniyê nıvisan
Dı dıl de birina mın
Bıbışire.
Çı dibe,
Hema hınek bıbışire.
Bo
Gul bıbışkife dı bıškoja Rojê
Dılop dılop xwin bınızile
lı hınarikan
Dıl tawi ye,
Ketiye taya sar
Bıbışire
Da ku
Tirêjên Gelavêj,
dı dıl de bıqijile.
Bıbışire
Çı dibe hema hınek bıbışire
Û paşê
Bla taviya çavên pijak çimani
Bı ser xal û xetên melûl de bışırşire.

Ezê xwe bîdîm bîn taviya Nisanê,
Taviya Nisanê bî bihn û adanî ye
Ew,
Bla lî derya dîlî bîwirwîre.
Paşîya taviyê,

her

keskesor e,

Destpekâ wê, jî çavên çîmanî
Kutayî jî, bla dî dîlê b' kovani de be
Û pê re
Bla laşê mîn
bîşemîre.

Bîbîşîre

Evîna mîn

Lî enî nivîsan

Dî dîl de bîrîna mîn

Ez bengî me

Jî van deveran dîçûm

rêwîngî me

Dîl axekî bêweç e, terk bî terk e, dîpîncîre.

Gelek e, dîlovani lî cem bedewa

Çî dîbe?

Bo serê xwe

Hema piçek bîbîşîre.

Kuda Dıçın?

M. ŞEFİQ

Ûsıv, lı ser milé çepé zıvırı, lı Sléman nihért. Sléman dıponiji. Ev çend rojekéf û şénañıya xwe ya beré wında kırıbû. Zû bı zû bı kesi re ne dipeyivi. Jı hevalan dūr direviya û bı seré xwe dıçû deverna. Bı çend sıeta xuya ne dıkir. Ûsıv dıxwest hın tıřta jé bı pırse, lé réya xwe ne didit. Jı bo ré veke, jı Sléman pırsi.

— Slémano zani ez do leqayı ki bûm?

Sléman hédika lé zıvırı û bı awırek vala, bersıva pırsa wi bı pırseki diné da:

— Leqayı ki búi gelo?

— Osman, Osmané Xelil.

— Lı kur te ew dit? Çı dıkir? Çı dıgot?

— Lı qehwé. Do pıřti tu jı me veqetıyayı çúi malé, em qaseki dın jı bı kaxeza leyıstın. Ew jı hat qehwé. Pır rûnenıřt, zû rabû çû. Pırsa te jı kır. Lé pari made kırı bû.

— Ew çıma mad û mirüzé xwe dıke? Kéf kéfa wi ye... Ew û pıreka xwe her dû jı dıxebıtın, rojé du yewmi dıstının. Karé hésan, pembû berhevkırın ma tu dibé qey pır zor e.

Desté xwe lı berıka xwe gerand, çıxare derxıst, yeké da Ûsıv, yeké jı wi véxıst. Dı ber wan de sé keçık derbasbûn. Bihna ko jı wan dı fûriya dı dilé Sléman de péjna odén sor véketi rakır pıya. Lı dû keçıkan awırén wi yé birçi meřıyan. Ûsıv hat bira wi. Lé veğeriya:

— Osman qe ne be évaré tevi pıreka xwe radızé. Lé em...

— Na lo. Ne jı ber van tıřtén hané. Jı bo kurké xwe mirüz kırı bû. Lı gor gotına wi lawık pır bé hal ketıye. Laşé wi sıncırı heta sıbê

dı xweydané de dimine. Jı lawıké re çend aspirin kırı û çû. Heré li der û doré wan çadıré nas hene lé disa ji divé mirov êvarê li malaxwe be.

Osman... nexweş... zarok... dı seré Sléman de çûn û hatın. Ne xwest peyvê dirêj bıke. Tené got:

— Belé.

Xweydaneki hûr dı laşé wi de avét. Bı devzendiké ko ji qiréjé demûş girtibû eniya xwe paqış kır. Çavén xwe li der û dora xwe gerand. Jı hejmara wan, ya şeveqé, pır kém ne bûbû. Sih-çıl zılam li héviya «qısmeté rojé», hın ji pıya, hın ji q'lûskdayi, li dor «Küçük Saat»é civiyayi bûn. Dı bızav û peyvandına wan de sıstayi û dıxwer-neditin dıxuya.

Sléman ji wek hemûya bı şeveqé re rabûbû. Şorbeniskek xwarıbû li cem Eli Hosta û rast berê xwe dabû gastina «Küçük Saat»é. Pır ne çû pénci-şést zılam li gastiné civiya. Dı dûre, hın ji wan li pey kardayoxa çûn kar. Ê mayi bı héviya ko ew ji kareki bîbinin ji seré çend sıeta vir de ji gastiné dûr ne dibûn. Lé édi hın ji wan dı navbera çûn û mayiné de dudıl bûn. Jı ber ko şewitandına tiréjen rojé xurtır bûbû. Weka ji wan re béje «Rabın herın, nema wın iro kareki dibinin». Karkeré ko Edené nas dıkırın, dızanıbûn tav çı dibéje. Wan dızanıbû ko pır na çe, ev kılora sorezer wé pétiyé dojehi li ser bajér bıbarine. Dı wé demé da ji papûr dé alav bıde. Dı navbera her dû agrıan de mirov dıpije. Jı ber germa fetısoki û zeliqoki hemi jindar xwe davéjin ber sıyé.

Çend kesé ko héviya xwe ji ditına kar birin, rabûn çûn. Ûsiv bı awırén «Ma em ji ranebin?» li Sléman mirúzé xwe tırş kır û got:

— Ez nayém, dıxwazi tu here.

Ûsiv dıxwest wi ji bı xwe re bıbe, lé, xuya dıkır ko ewé Sléman ne çe. Ûsiv xatır xwest, çû.

Sléman dı ber xwe re «Ev roja sısiyane ko ji beriké dıxwım. Çewa ezé herım?... Ewé iro vala ne bıhure. Nıqutiye dilé mın.»

Beré xwe da wi aliyé papûré. Çavén xwe li nav lehiya çûnehaté gerand. Çı dibû yek ji nava vé lehiyé bı hata ber, û jé re bı gotına «Ez xani lédıkım. Jı mın re betonréj divé. Ne karé rojeki û du roja ne. Yewmi ji baş e.» Na... Na... kes bı ali wi de ne dıhat... Çavén wi bı keçikeki ket. Pantoreki wısa teng li xwe kırıbû ko, yén dı bıhurin disa dızıvırin û lé dınhértın. Sléman dı ber xwe re çéreki pır nuqte kır... Jı nû ve çavén xwe gerand. Ha... eré eré... Zılamak beré xwe dabû aliyé wan. Dıxwest derbasi vi aliyé papûré bıbe. Lé ji çûnehata wesaitan ré ne didit. Li wan dınhért. Belé belé li Sléman dınhért.

Sléman zanibû, niquti bû dilé wi. İro vala ne diçû. Belki sibé ji, dusiba ji, sésiba ji... çima ne be?

Zılam dagırti û por şekırî bû. Awırén Sléman wi hışk qefaltıbû. Wesait kém bûn, zılam lı rast û çepé xwe nihért, bı gavén lezandi derbasi vi aliyé papüré bû. Gıhışt vi ali, demek sekini, awırén xwe lı ser komé gerand. Sléman hebûna xwe dı çavén xwe da cıvandı lı çavén zılam dıgeri. Hévi bû çûk, çûkek lı ber fıriné, hat lı ser dilé Sléman dani. Jı ser dilé wi fıriya hat lı bibikén çavén wi dani, bû du nuqté ronahi wer sekini. Qefalt, çavén Sléman awırén wi zılamı qefalt. Zılam lé dınihért. Zılam ber pé meşıya. Sléman züç ma bû, awırén xwe ji zılam ve ne diçetand. Zılam hat, hat lı beré sekini.:

— Niçin bana öyle bakıyorsunuz? (1)

Sléman lı hev şaş bû.

— Ben... ben... size baxmıyor. (2)

Zılam lı xwe ne girt zéde pé re bı peyive. Bı awırén tér û xwe binayi lı komé nihért, meşıya çû.

Sléman hay ji xwe ne ma, bé hemd çér ji devé wi vala bûn.:

— Mın dı

Çıxareki véxıst. Jı şerma çet lı komé ne nihért, meşıya çû.

Dı ber deré sinemaki de dı bıhuri. Desté xwe lı berika xwe gerand, lı keçikén ser kaxez yén ipela tazi û dikenın, nihért. Bılét stend, ket hundiré sinemayé.

D A W İ

(1) — Çıma wer lı mın dınéri?

(2) — Ez... ez... lı te na nére.



E. YAVUZ

DERGÜŞ

Çirok

Car Zane,
Zêr Zane,
Zor Zane...

FERİDÜN SALAR

Roja şemiyê, şemiyek ji şemiyên Gelavêj bû. Roj zû da li ser milê roavayi qelibibû, lê disa hêji helekeleki germixoki û fetisoki bî tundi hebû. Ne ji aliki ve sireki dîhat, ne ji peleki li daran dîlîpiji. Herweki dirneyek li hevana dojhê ketibe û helekela wê ya hêtûni, mina mozîkê mozîkî ku kertîkê xwe qetandibe wîsa li dinê belav dîbû. Ji nivroyên bajêr, dûyekî giran yê ka û xîşolê hîldîkîşî, tevî bêhna xwe i pis li ser bajêr dikumîşî. Îro şemî bû, roja dadana kûra qewaqa...

Qamyoneki bargiran di kolana mezîna da, misêwa bî qlakson lîxîstîni, xubar û gemara kolanê li pey xwe bî bakîrîni derbas bû. Barhîlgîrên pîştî û yê nî navgîndar, bî lez u bez dan dû qamyonê. Qamyon, li ber dîkanên zêrzewatfrosên mezîna rawestî. Ji barhîlgîran, zarokan, esnafan lehiyek ji sê alî ve ber bî qamyonê herîki. Boşahîki bî geremolî li dorê hêwirî.

Hemê Teyo diqirî: «Wernê... wernê... erzani ye, ne din e, ne iman e balican bî bîstî, erzani e, erzani e...» Hemê Teyo tîredîneki bajarê me ye. Gotîneki pêşîyan he ye: «Her gundeki xwedî dineki, qehpîkeki û seki dijwar e». Tîredîneki me i navdar ji Hemê Teyo ye.

Rojnamefros bang dîda: «Haydê rojname rojê... haydê rojname rojê... nûçeyên teze û nû... haydê rojname rojê...»

Ji paplûkên derença pêwara memûran, Qeymeqam bî girani, bî awîrên niv ferma û niv beşerûki hîldîkîşî. Saqoyê xwe i li hev

nûrandi avêtibû ser zendê xwe i çepê. Milên qutikê xwe i spi pêça bû heta enişdan û vegirtinê. Di aliki de ji çavê xwe li ser masa, li nasan dıgerand. Wi kesên nastir ne ditibe ku hindava meşa xwe ber bi masa min ve zıvart. Bı fesala çend pêgavan nêzikê min bû, bı beşerûki:

— Rojbaş berêz Baran!

Ez rabûm pê bo Pêrgina wi.

— Rojbaş Qeymeqamê me.

Min tafilê sandalyeki ji ber masê kışand, Û lê zivirim:

— Fermo, em rûnên.

Qeymeqam beg dudili bû. Dıxwest rûnê lewra ji min nastirintir- reke wi li wan deran tu ne bû, ne dıxwest rûnê lewra têkilyên me di tengasiya fermayiyê de kurt, teng û qels bûn.

Sandalyeki di kışand, saqoyê xwe i nûrandi bı endaze dani ser paldanka wê, li a ku min kışandibû nihêrt, qınyata xwe bı paqıjıya wi ani, rûnişt.

— Ê... çawan i berêz Baran?

— Spas efendim. Hun çawa nın?

— Spas... ooof ev çi germek bêhnfetısoki ye? Qet nayê kışandın.

— Belê germeki gelek pis e.

— Min gava di, beri bêm vê ava sar ji li xwe kir disa ji bereday e.

Çawa ji avê derketim tafilê wacek li min çêbû, xwêdanê di min de avêt.

Serçayger hat, nêziki me bû. Bı rawestaneki lejkeri çikiya. Bı serheji pırsi:

— Fermo... we fermanek he ye efendim?

Me çay xwest. Serçayger du xwelidankê paqij ani dani ser masa me bı endaze vekışi çû.



Hê nû hatibû. Hefta wi hê nû qediyabû, heşt meh berê. Gerin;endeyê min, li min bû moz û bı min ve zalıqi:

— Haydê em herin bixêrhatıniya Qeymeqam beg.

Min kir ne kir bela xwe jê ve ne kir. Bı zorê min wi du sê roj xapand, lê disa wi ez bı zor birim bixêrhatıniya Qeymeqam begê.

Dibe ku ne kurmek pak be, an ji kûviti be, lê çawa bikim ne di destê min da ye. Tu car na çim bixêr hatıniya gerinende û hevotıyan. Çawa be em dê rojeki hevûdı binasin ji xwe. Ê di zêzewatên zêde ne. «Çawan i efendim? Spas... Tu çawan i? spas...» Gışt pırs û bersivên ne ji dil, yên ji qırıkê berjor...

Em çûn. Me bixêrhatîni tê da, rûniştin. Dî çarçîfa fermageri de em qasek mijûl bûn. Hinek tiştên karbidestîya gerinendetîya me pîrsî. Ditinên xwe î arîzi yê derxîsûsa karbidestîya me dîyar kîr. Bî kurtayi ditinên xwe î sıvakhêvoji vekîr, gote me:

— «Serûber bûyîna cıvakeki, bî pêkanîna qanûnan lî ser reyâ durustîyê ye. Divê em gişt, çî hêvotyar çî hêvotvan bî durusti, bî pêrerastbûyîna qanûnan, qanûna bimesînin. Şêla xwe, tevgera xwe dî nav çarçîfa wê de bîdîn hev. Efendîm ku her kes dî tenga, dî hindava xwe de bixebite, wê welatê me jî bîgîhîje gîhanekâ peleyên pêşveçûyîntîrin, yê mezîn. Ew peleyên ku peleyên jî xwe qelstîr dâdbîlînin. Sermayedar dî tenga xwe, xebatkar dî tenga xwe, se ansêr her kes dî hindava xwe de jî bo vî welatî bixebite, karkêr karkêrîya xwe bîzanîbe qînyata xwe bî romîzîya xwe, sermayedar jî sermayedarîya xwe bîzanîbe qînyata xwe bî kara xwe bîne, mîlkdar bî mîlkdari, gundi bî gundîtîya xwe qînyata xwe bînin û ku jî bo bîlînd û gewre kîrîna welêt bixebîtin, wê çaxê wê welat jî şerpeze bûyîné bîfîlîte. Vatîniya me, wezîfa me ev e. Bo pêkanîné tîştêk bî tenê pêwîst e; mengîwer bûyîn. Jî me re mîrovên, hêvotyarên, karbidestên mengîwer divê. Dewlet dî ser her tîştî de ye. Em lî vê derê nemînen-detîya dewletê dîkîn. Çawa dewlet dî raserê her tîştî de cîh distîne, welê jî em hêvotyar pêwîst e ku rasertîrê damezranên sıyasî bîn. Divê berî her tîştî bawerîya me bî xurtbûyîna me bê... «Em Kemalîst î, divê dî bîn ronahîya bîngêhên vê rîyê, em rê bîşopînin.»

Besta Qeymeqamê me î nû, berêz Fuad Uçar lê vebûbû. Mina her hêvotyarên parêzgahî an yê navçeyî dîxwest ditinên xwe î arîzi bî niv-şîretî û bî niv-fermanî ragîhîne yê berdestê xwe ku ew jî lî awayê wî serevabîn. Hêvotyarên naverastî yê dengbarîvan ditinên xwe î derxîsûsa şopandîna kari, bî namedoran radîhînin pajên xwe. Serêşandîniyên wan hebîn jî dî rûpelên namedoran de dîmînin. Meriv dikare ne xweyne.

Me jê xatîr xwest, em rabûn, ew jî rabû heta ber derî em verê kîrîn, em hatîn.

Çend meh tê de bîhurî. Rojek disa lî pêwargêhê rûniştîbûm, gerîmendê xwendegêha pêşî Eli beg hat. Kek Eli. Lî her navçeyî, parêzgehên piçûk jî vî Eli begê, her yek he ye. Bî gelê ciwari re bî zmanek qube û ferma dîaxîfîn. xwe jî eşrefa dijîmêrîn. Jî alî famîlyê ve ne axa ne, ne şêx î, ne karkêr û gundi ne, lê rehên wan î cıvaki dî aliyê jin dan û stendîné de dî nav van giçtan de belav bûye mîna

dafika piravtonkê. Dı nav qora feodalan û dı nav qorên gelêri yê dı de ketine hesarê, hatine givaştın. Geli, wan bı bernavka efendi bınavdıkın. Herweki Cındi efendiyê Piro, Sofi Ahmet efendiyê Kalo, Bayram efendi, Aydın efendi, Dawidê Gulşê efendi... Efenditiya wan ne ji ber xwenda bûyına wan e, Lewra nıvısana wan pıran drûvdaiyê rêça qıjkê a lı ser berfê ye. Hetani çend sal berê ji, heta pênûsê dı zmanê xwe ne dana, bı zmanê xwe şıl ne kırına ne zanibûn bıvıvısın. Jı vana re eşraf dibêjın. Bı gelemperi bermayê çandemenddarên tırki, yên dema şarederi kırına Kurda ne. Revena ne bûn Tırk, Kurd bûyın ji lı wan qar hat.

Eli begê ji, bı malbati endamek ji endamên vê qora cıvaki ye ku hat danasin. Begitiya wi ji ber mamostaiya wi tê, ne ji torınıya feodali. Lê em jê re na bêjın Eli beg. Bı rasti em jê ne wêrın. Dıvê ku em bêjnê Eli abê. Kek cli an Kekê Eli ji na be, ji sergiraniya ferma re dest na de. Pêwist e her bêjnê Eli abê.

Eli abê nefis tenik ın lı ber keç û pirekan. Nê ji hêzkariya wan i zayendeti, lê ji ber bajarvaniya bılınd pırani bı şexsê bıli ne. Eli abê bıyanihız ın; ne ji ber mirovhızıyê, ji ber dūrketına ji gel û cıvaka xwe û bı wan dan baweri kırına şarsaniyet bûyına xwe. Gelê wan hê dema hovitiyê dijın, lê ew bı xwe xwenda ne, çandemend ın, şarsaniyetmend ın. Lı cem bıyanıya tevgera wan zırav e, bı kawdari ye. Lê weki dı, ango lı dervayı cıvata bıyanıyan qure ne, rageş ın, mırûskiri ne. Eli abê ne bıhize lê tirediniya wan gelek e.

Eli begê:

— Merhaba berez Baran. Çı diki?

— Rojbaş... fermol Rûnani?

— Mın çavê xwe lı hevala gerand, wa hê keş tu nine lı-pıyasê. Qasek lı cem te rûnêm.

— Xêr be, heval ki ne?

— Heval?... humm... Ewk ın lo. Hevalên listikvan. Ên qonkenê. İro gelek westim. Birader ka çawa tê ne westi ku... Az carna dibêjime we belbi hun lı ba xwe dibêjın «Eli abê neyarê xelqê xwe ye, an ji dijşoreşgêr e». Birader ên me na bin meriv. Oxlım lawo hun çı dıxwazın? Hun lı navçeya xwe mamostayi dıkın, dewlet mehmızıya we dıde, ji bıli berpırsıyariya xwe ma ku hun dı karê xwendegêhê, dı yê dı de ji bıxebıtın ji na be. Wê kevır bıbare. Na bin meriv, na bin meriv. Bınêre vi Qeymeqamê me çı meriveki baş e. Vê navçeya me heta iro qeymeqameki wısa ne ditiye û ji niha pê ve ji dê ne bine. Jêhati, jêhati. Mengiwer, mengiwer. Komarperwer, komarperwer. Ne hıştın eefndım ne hıştın...

— Kijani? Kijan qeymeqam?

— Canım kujan he ye? Fuad Ūçar beg.

— Çı biye jê?

— Çawa çıbiye jê, ma te ne bihistiye?

— Na... min jê hay nine.

— Rast e, tê ji ku bibihizi. Mihemed axa li serê digere bo ji vê derê rakın.

— Çıma?

— Meseleki dŭr ũ drêj e. Viya heft meh berê hat vê, dest bi kar kır. Dı pişt hatına wi de, Mihemed axa diçe bixêrhatınıya wi. Xwe pê dide nas kırım ku serek navçe ya parti dadnasi ye. Darazdar Çetin begji bi axatıya wi, wi dide nasın. Tabi qeymeqam ew qas rŭ na dê. Tê de meh ki dibuhire na bihure, bi xulamê Mihemed axa re demançe tê girtin. Mihemed axa telefonê amirê ewlekariyê dike, amir dibêjê: «Axa tu li min me gri, wellahi ji tirsax qeymeqam ne wêrim. Ne ji Fuad beg biwa min dê berda. Mihemed axa ica telefonê qeymeqam dike bo berdana xulamê xwe, Fuad beg li irzê wi dikeve, wi dihetikine. Tabi xulamê wi çend roj raza paşiyê di dadgeha aşıtiyê de bi cezaki hindik jê filti. Ew çŭ. Dı çaxê zıbla kimyewi danê de qeymeqam dest dani ser belavekırinê, ji devê guh ne da Mihemed axa. Mihemed axa sondê lê xwar. Mirza vê biravê min digot Ew li rawestingeha axê biye, Mihemed axa telefoni Serekdengbar kırıye. Pişti pırsa hev ũ dı kırım, gotiyê: «Kaka berêz Dengbarê Navxwekari çi dike? Li kî derê yeki sor i bêkêr, dijminê geli, qomonist he be ji me re dişine. Mêrik weki ne qeymeqam be, peyayê qomonist ũ veqetandîngêran be berberiya me dike. Îsal kesi ne zıblê stend, ne qrêdiya çandini... Hee... navê wi? Hın hın navê wi Fuad Ūçar e, Fuad Sıçar e...? Fuad Ūçar. Kaka wellahi ên me şewitın, qeliyan. Bo nŭçe stendinê kengê li we bigerım? Mehki şŭn da? Na kaka pır dereng e. Milet qeliya dibêjıme te.» Tê got erê?

— Belê guhdariya te dikım Eli beg.

— Heftêki şŭnda, Dengbariya Navxwekari gazi Fuad beg dike. Fuad beg çŭ, panzde bist roj li serbajêr ma. Jê re dibêjin: «Ji xwe re cih ki dinê bibjêre an ji lingê xwe bi endaze bavêje.»

— Ê paşî?

— İro du sê roj e, wa zıviri hat. Tırketırka dilê wi ye. Ku wi bırdın dereki dı, sicıla wi ji dê xera bibe. Lê te diye kes dengê xwe na ke, na bêje ku Mihemed axa lawo ka tu çi ji camêri dixwazi...



Serçayger li ser tepsıyek paqıj, ji paqıjiyê çıris bi çıris çayên me ani, mina gava dı, bi giramgiri ũ bi endaze pêşiyê a Qeymeqam beg

dû re a min dani ber me. Lî ser tepsiyê du pıyanên av dagirti hebûn. Bî giramgiri pırsi:

— We av diva efendım?

Me av ne va. Serçayger bî giramgiri xwar bû, vekışi, çû. Me şekirê xwe avêt çayê, lî hev xıst. Mın jî Qeymeqam beg pırsi:

— Nûçeki dıgere dı bajêr de; dibêjn ku te jî vê radıkın. Rast e gelo?

— Ka em binêrin. Niyeteke mın i wısa he ye lê hê mın tam bıryar ne daye.

— Xêr be? Hê heşt mehê we ne qedıya. Jı ber sedemên sıyasi an ên arızı?

— Na canım. Tu sedemên sıyasi tu ne. Ez qeymeqam ım; bî akamên hêmanên sıyasi kes nı kare mın jı cihê mın hiline. Me nihêre mamosta û memûrên dı, bî hêmanên sıyasi jı cihê xwe tên rakırın, lê ê me ne wısa ne. Em neminedeyê Dewletê ne. Em hem neminendetiya Serekkomar, hem jı a kırdayetiye dıkın Kijan hêz dıkare me jı bo daxwazên xwe i sıyasi rake. (Bışiri) Ma ne wısa ye berêz Baran?

— Wele dı hoyên iroyi de her tışt dıbin. Tên hişê meriv.

— Na canım na berêz Baran na canım. Ên mın, hinek hoyên mın i arızı, yên malbati he ne. Ew jı hê bıryareki dayi lı navrastê tu ne. Tenê dı warê ramandinê de he ye. Ka binhêrin. Qeder, qısmet...

Rıdwan, nıvisvanê dadgehıyê hat, nêziki masê bû, destên xwe dı ber xwe de berda, bî nivxwarbûyini gote Qeymeqam:

— Qeymeqam beg, Çetin beg û yên dinê lı hêviya te ne.

— Yaaa lı ku derê ne?

— Lı hewşa ewlekariyê ne efendım.

Qeymeqam beg rabû, rahişt saqoyê xwe i nûrandi ya lı ser sandalya a kêleka xwe. Ez jı pê re, bo verêkırınê rabûm.

Qeymeqam beg:

— Bı xatirê te. Bo her tıştı spas berêz Baran.

— Tika dıkım berêz Qeymeqamê me.

Qeymeqam beg lı pêşı, nıvisvan Rıdwan lı pey veqetıyan, çûn, jı derencê pêwargehê dakışın.

Hewa hê jı germıxoki bû.

Dotıra rojê, mın Ferzendeyê Bışar, şaneyê Mihemed axa dit. Dıçûm malê, wi ez lı ber dıqana Selimê Silo gırtım:

— Malava tu qet xwe lı meriv danayni. Ma dostani wısanne?

— Êra xêr be? Ev çı karozi ne?

- Bise emê hêdi hêdi keysa we bîdın we Me keysê lı we anye.
- Bîné zmanê te şıl e. Te disa çı bîhistiye?
- Merivê we duh hat koşkê.
- Merivê me kî ye?
- Qeymeqamê we i dij-axa, ew ji hevalê we bû ya.
- Ê... xêr bû, ew û kî bûn?
- Ew, Çetin beg û hinek zêrzewatê dî.
- Hatibû çı?
- Hatibû şefaet xwestinê. Xwe avêt Apo, hêvi û dexalet jê kir.
- Apo kî ye?

— Mihemed axa lo... Em jê re dibêjin apo. De bise jı te re bêjim. Apo lı vê derê kir ne kir, efendiyê we ne hat rayê. Telefoni Serekdengbar kir, çendeki dı pey re Dengbari gazi kirê, ber wi wali lı ırzê wi ket, efendi seri danani. Pişti ku çû serbajêr, nihêrt ku henek menek ni ne, wê malê lı piştê kın, berê wi bı aliki dın de kın. Heta Dengbar telefoni apo kir, gotê «va bîryarnama wi hazır e, ew bı xwe tê ku we lihev kir jı xwe lihev kir, na ku disa serkâşiyê bike, tu telefoni mın ke, tafilê bîryarnama wi bîşinım imzayê». Te got erê.

— Ê...

— Ê û ê... Duhi hatın digel Çetin beg, wan. Xwe avêt Apo. Rıyê xwe dı erdê da. A ku dı ber rıyê de ani got ku Xwedê ne gravi dıbin akama hinek gotinên ku hınan jê re kirine maye. Jı niha pê de van kıl û kêmasıyên ha de cari ne bın. Hêvotyari tişteke gelek hêsan ni ne, digel zorbûyına xwe ve hinek kêmasi, xeleti jê çê dıbin. Bla axa van kıl û kêmasıya bîde bin lingê xwe. Jı xwe ew ji bo xızmeta miletê hatiye, gelo jı miletê û serwerên wi yê serbijare re xızmetê ne ke, dê ji kî re bike. Te got erê kirıva. Weşek bı kêfa te rûniştın, lı ser daxwaziya Çetin beg rabûn tev de çûn parêzgehê.

— Tu ji çûy?

— Ez ji çûm lê çawa. Em çûn Atlanta Palasê. Pêşiyê bı dilê mın û te me xwar û vexwar. Paşiyê tev de em dakışın pawyonê. Berdesti spêdê em zivirin.

Olaksoneke tûj dı bın guhê mın de lêxıst. Lê zivirim, ciranê mın i Yekta bû. Yekta:

— Nayi malê ciran?

Braziyê Apê xwe dibişiri:

— Car zane, zêr zane, zor zane...

Derbasi rex Yekta bûm, teqsi birêxıst. Mın kaseteki lı tepyê xıst. İsa Berwari distra:

— «Esmere digot lawiko, bê sozo, bê qewlo, bê qeraro!...»

DUMAHİK

Deriname

Deri

Deri

Deri

vır da dınérım deri

wır da dınérım deri

deri kırne her deri

deri hene dar -jı daré kevot-

deri hene hesın -wek úr ú tırsén é pıřt mezin-

deri hene deri

wek deriyé koxa

-lı pıřt wan

her yek lı ser çar darıké bı eş ú jan

panzde seri

deri hene deri

lı pey hev bı notırvan

hın bı bertilé vedıbın

hın bı fırtiné

deri hene vedıbın berdesti sıbé

bı singüya

deri hene vebüna wan

bı satılcan, jana zırav

bı xéra

mırına

zarüya

vır da deri

wır da deri

deverek ne ma vekiri

afırandın kılitek mezin ú zıngari

hın jı qelen hın jı esalet -werdekiya nav mırıřka-

avétın ser deré dılan

radan

deri

deri

deri

na be

wıha na çe seri

JI NAZIM Du Helbest:

Ayê

Ayê kî herri di hinda miclewri
aw di hinda masi,
hewa ra hinda mîlçikan zafê;
teres,
bêters,
nezan,
zanaye
û gede yê.

Ow ayê kî mirênenê
him zi virazenê ê yê.
«Destan»ê ma dir mesele y inan tenya estê.
Ê yê kî pey bî dîşmeni xapênê
û dîşmeni raşte di verdanê -
vazdenê keyandê xwî.

Û ayê kî yew bêdini erzenê xenceran fek
Û aye kî zey yew dara kihoy hiwenê
Û xwî vero bermenê
Û nengan çinenê bî mar û piri,
«Destan»ê ma dir mesele y inan tenya estê.

Asın,

komır

û çol

û oqyanoso hewz

Û siudê rayıranê royanê derdênan

Herra ramıta û şarıstanan

Yew nımacê cûserra bedelêno.

Yew nımacê cûserra kişta tari ra,

Key kî inan destê xwinê girani herri şanay

xwı rast kerd.

Ayé kî rısmânê en weşan lilıkanê en rıندان sero

vırazenê ê yê.

Seserra ma dı inan zor da, zorê inan şı.

Zaf çiy vajey inan sero

Ow ina nrê vajıye kî:

«Rêzılanê ina nvişêr tebayê vin kerdışê inan çınnıko.»

Tadayox: Malmısanıj

Strenên Me

Stranên me
divê li berbajarka derkevî kolana.
Stranên me
divê, li ber malên me rawestî n
û li cama xî
bigrî bî destên derîyan
bigvêşî
heta ku tahl kî
heta
ku derî milên xwe î grêdayî vekî.
Em fêr nakî
jî strana jî devekî bitenê.
Her şeva şî
her roja cejnê,
stranên me
bî li xwarê xîstîna sîndoqa don
û bî derketîna serê
divê, bî lepên xwe î qrase çepîk bî kutî.
Stranên me
mîna bayek jî darîstanên kajan
divê, xwe tev jî yek devek bî me bîdî strandî.
Stranên me
divê li qora pêşî, li pêştir raperîkî dijî.
Divê berî me bê gonandî
rûyê stranên me bî xwî.
stranên me
divê li berbajarka derkevî kolana.
stranên me
nîkarî rûnên dî malê derî radayî
perde daxîstî
ya dilek bitenê!
stranên me
divê derkevî bayê.

Estaneka Mêşna

Niwîştox: Sabahattin ALI

Wextê dî yew darîstano daroberêno herr û heray ver dî yew mergî dî yew pes bî. Pesi sero zi, bî kutîkanê xwî, şîwaney inan bî.

Vaşê mergî timo zaf û teze, awa çemiya kî verra vêrena zi zaf û pak bî; asaneya mêşnan cadî bî, çimka kî amnani ca o kî tedir tay darê girri kî ê binê inan dî rakuwi ow zimîstani ziyew mexera kî serdi ver ê şînê mîyan dîr bî manê biy.

Labrê ancina zi keyfê mêşnan ca dî nêbî. Înan gerre y şîwani kerdni. Mûy sîpi dekewt biy erîşa ni şîwani ow yu nimac ra heya şan hiran ra rakewtni, ge ge zi yew cif lûliya xwî cenayni, kutîkan ro berrezîyayni, rayna xwî dî şîyni. Mêşney dutini, heyena kî şînayni şît werdni, ayo kî nêşîya bîwero rotini; gama kî zerra ey waşt, yew kavîr sere bîrnayni, pewtni, nê zi yew mêşna sere bîrnayni, zimîstani ri goştî viraştîni; dî hîrî hewtan mîyan dî celeb kî ame mêşney û kavîrê en qelewi dayni cî, peyni dî rayna rakewtni, xwî dî şîyni. Wa ni pêro ayca bîmanê, mêşnan semedo kî zanaynê kam mêşna ey dest kuwo, peyeni qesabi resena, kam gama kî no mêrdeko goniwer bihasayni ê recefîyaynê, xwî têbîna kerdnê vero ameyîş bîra inan vir nê kewtnê. Sekerê? Sazumanê na dina enawa bî.

La enê mêşnan mîyan dî enê karan ra çiyeki hêştê tayini nê kewtni, tayi zi biy tersdê yew roj dekewtîşê binê kardi reyra gani mendîş ra w se, waştîni na mesela bîncaran safî bîkerê. Roj bî roj enê vişî biyni. Ma vajim kî: gama kî kê vatni qey çîkî pes esto xwî ri

çereno, nişka mıyan ra yew berano kelebıyaye perrayni qıneste y şıwani qoçi kerdni. Şıwane sew adê bifetelno, pey bı kutıkan ey bitebişo, bigiro yew darı ra pêt bıbesto ow tujaro verên kı ame bıdo cı zi, çımê ay binan hewna nê tersayni. İnanê kı vatinê: «Senê bıbo peyni kê sonê qesabi dest, ewro zi bıbo meştı zi bıbo yew o!» ow qoçê wxı weşanaynê, roj bı roj vişi biynê.

Mêşna me vajê me vinderê. Mıyanê inan dı zi, çı berani çı camêrdeki estê. Verniya dina ra mêşney heme, şıwani û kutıki reydi nêbi kı! Ê zi yew wext qesab û celeb, şıwane û kutıki ra bê hagi bi; xwı ser geyraynê, werê xwı peyda kerdnê, dışmenê xwı qoçi kerdnê fetelnaynê.

Labrê inakê kı çım ver goştê mêşna da, inanê kı şitê mêşnan ra ruwen û penir, çerme y yeni ra kurk û çarox vıraştê, verê verkan mêşney day bawer bıyayış kı, eksow bê şıwane bımanê veşaney ver gêstı mriênê. Enawa ra mêşney zi xwı ra bawer nêbiy, héviya inan qewetê xwı ra nê mendı. Va qey şıwane qandê goştê inanê nemri ra nê, qandê çımanê inanê sıyayan ra inan cenaweri ra paweno, yew qevda vaşi erzeno ver.

Ey heze kı ma va, hêdi hêdi hêşê mêşnan ame sere. Şıwane y zi roj bı roj xırab biy bi. No peyen bıra rınd qeşmer bı. Keyfê xwıno asaneya xwı vişêr teba nê ardni xwı vir. Gani deme w kı cenaveran ramıtnê pesi ser, heway şıwananê verênan çıwa xwı bı gırewtni, kutıki xwı dıma rêz bıkerdni, bışini vera. La ey -wini nê kerdni- çend hebi mêşney, kaviri eyştı, xwı ser deh kerdnê.

Rojan ra yew roj heybanê kúiyi û cenawerê kı darıstanê nızdi dı, kewti tê mıyan. Semedo kızımıstan aya serrı xıdar bıbı, vergi û heşi kı bê wayir mend bi kelebıyay bi. Vengê lawayış û qırriya inan ver kı hetani merga pesi ameyni, mêşney û şıwane piya tır tır recefiyaynê. Yew fesle, çend vergê kı leca darıstani dı birındar biy bi, remay bi, nê zi gêstı zaf şatıyay bi û nê dekewti bi leci, xwı eyşt bı kıştı darıstani. Senê mêşneyê tersi ver şaşbıyayey diy va: «Embazênê dışmen hını yo!» ow rıkêf kerd ser. Labrê mêşnan demewo kı fekê vergano akerdewo sur û dındanê inanê gırdi diy, fahm kerd kı mesela heneki niya. Kutıki zi semedo kı meşhey inan dest ra şêrê veşan manenê, bı no fikir xiret kerd, hemini piya ramit enê verganê şeteye kan ser. Beranan serey xwı na bı xwı ver, bı qoçanê xwınê xışnan, ramitni cenaweran ser, kutıki zi gellek laway, hermele kerd. Vergê veşanê kı xwıra gêstı bê zıdı mend bi ow zorkani lingan sero vindartnê, tıra çend teney cadı apey vazdey darıstan, ay bini zi merde erra kewtê.

No hing dı şıwanewo kı cay nımtışê xwı ra vecıya, bı weşanayışê çıwa ba xwı, waşt kıfına bêro pesi ser, ay çaxan mêşnan hêşê xwı ant

pêser. Qesab û celeb ardê xwî vira. Kutikan zi qırar da kî wextê çıwa da cı ra xellesiyayişi û mêşnan reyra tena mendîşi yo. Hemini piya ramit şıwani ser. Şıwanewo weqefiyaye rema ganê xwî zor xellesna, gilangina zi ay beyntaran dî nê hasa.

Hına wişi eno lec dî karê kutikan bî. Heta yew ra mîrdalê verganê kî mergî de, hetê bin ra: dades mêşnanê kî lec dî merd bî wardi bî, rind mîrd biy bî.

Dest pey kerd keyfi reydi boça xwî têsanay, ziwanê xwinê suri reyra xwî lişt, ay beyntaran dî geyray û va: «Şıma diy kî, ma, şıma vergan ra zi, şıwani ra zi xelesnay!» bî enawa mêşnan sero paye kerd. Verra zeman kî viyart, pırnıka inan hina berz biy, me vajî kî: kutikeya kutikan tersdê şıwanan ver bî, senê kî bê şıwane mendî inan ra bêter biy. Çendekî lawaynê, vengê inan weşbê xwî şıynê, vatîné: «Vengo kî pey mêşney şıdıyay, pey vergi tersay û remay no yo!», çıqqas kî tedır biy vengê xwî pil hesebnaynê. Vatîné qey çend teney vergê birindari û lengayey ma bî lawayiş remnay, Qandê na ra vatîné qey, ma ay kutikanê binan ra niyê. Vatîné: «Kutik çı vatiş o? Qey eslê ma zi verg niyo?» Ow wesefiyaynê.

Verra no fikir dekewt hêştê piyorini. Dest pey kerd, cor ra mêşnan ra ownıyay. Semedo kî tamıyay bi, semedo kî goştê inan xwî vir nê kerdnê, kişt û kınari dî kavıro kî teбіstnê cêdı antinê, parçe kerdinê wardinê, heyena kî mêşney kî tikê pesi ra aqıtiyaynê ramit inan zi ser. Vatîné: «Senê beno kî camêrdê sey mayê kî kalıkanê inan darıstan dır hukim kerdo, sıstki sıstki pawıteyoxeya mêşnan bikerê?» Ow werrek ardnê, waştinê kî fina darıstananê weşşıyan dır bigeyrê-hezey verênı-hukim bikerê.

Xwî çım dî çıqqas kî pil biynê, ehendna zi mêşney hina werdı diyini. Ê, ay mexluqê kî goştê inan werêno, şitê inan doşêno, aynan wişêr çıyna nê bi.

Vatîné: «Ma sowkî nê lawim, paşti nêdim bıder, enê verradayey nişyêni qoçanê xwî zi bî şuxılını. Darıstano xışino kî ma ver dî, tedır heyana kî enê çeqqalê nêbiyayey hukim kenê, enê beyntaran recef-nenê, na mergî dî hezey kaviri vindartişê ma şerm o, zaf şerm...»

Kutikan ra xellesiyayişi, hında şıwani ra xellesiyayişi asan nê bî. Enê him vêşi bi, him zi dındanê inan têj bi. Bêxeyja aya zi yew lec kî bî, a fesalî dî penc-şes mêşney cêdı antnê, cêra kerdnê. Coka mêşnan ebî meraq pawıtîné, vatîné: «La peyeni şe beno?» Û çımê inan nê birkaynê kî senê şıwane fetelna, enê kutikan zi deh bikerê. Labrê kutikan peyni dî serey xwî zi, ey mêşnan zi ward. Yew roj hina wişi diyax nê kerd, qırar da kî darıstani zeft bikerê Semedo kî zanayni xwî ser nişiyênê ni kari bikerê, mêşney zi xwî ver şanay, va:

— «Şıma pey bı qoçarê xwı rayırî akerê, ê kî şıma ver kewtê şıma inan tê fek finenê, ma zi dormarey şıma dı berrızıyênim, ma cesaret danim şıma û dışmenan tersnenim!» Aynanê kî va «peyniya ma roşn niya», kutıkan tıra va: «Alçax, teres, sıstek, xayın! Kutikê kî heway ma goniya verganê cusingın tede ya, bıra tı nê erjeni kî reydi wardi roşi!» Ow parçe kerdı zerba xwı wardi.

La vergan, heşan, parsan hetana kî keftaran û çeçalanê kî hıma kışta darıstani dı lemekan mıyan dıy yew gamı dı pes perişan kerd. Vengê lawayışê kutıkan hıma titikê daran nê resa bı fetesiya, goniya mêşnana germını, lezi palaxa ardi mıyan dır vindi biy.

Çeher panc hebi mêşney nêweşi nê zi ay piri kî nê dekewt biy lec û gelek kavirê tezey, mıxara kî kışta mergı da aya mıyan dı, xwı yewbina bına kerd bı. Qıjjiya kî darıstan ra ameyni, qalayışê kî qeseba kê veşnenê, lawayışê bê hêvi esnawıtınê, tersi ver recefiyaynê. Vengi kî biriyay yewbınaran ownırayay, inan fahm kerd kî, kutikê kî şiybi darıstani bıgirê ow mêşney kî bê hemdê inan, xwı reydi berd biy çı sere dı amewo. Inan mıyan ra dı beranê piri gıran gıran ver bı berê mexara şiy, senê kî dı teney kutıkanê kî wuca dı inan pawenê ver resay, ca dı qoçê xwınê kî hıma qewetê xwı pıyor vınd nê kerd bı pizzedê ay kelpano-kı nıka ha matmêndeki lawenê-cenay û eyştê hetani derewo kî deey aver dı. Dıma ageyray kavıranê mexara ser û enawa va:

— «Oxmı, na dına dır bê şıwane zi, bê kutık zi kê şiyênê bı manê. Labrê heyana kî ma na fahm bıkerim kê hergu hewı ehendi qırbanan bıdiy se. zaf rew cusê ma wedarêno. Balê qenêbo şıma çımanê xwı akerê kî, ewro ra pey eger hewına kutiki, hela ay kutikê kî xwı verg zanê, kutikê zúrkeri mesletê şıma bıbê, şıma bışênê pesi inan dest dı nê verdê û xwı ser deh bıkerê!» -1946.

Tadayox: M. Dewıj

ZARGOTIN (Çiroko Geli)

Şiretê Kali

Vanê cay dı wextê dı padişayeki bı, wezirê xo ra. Padişay wezirê esto. Roji veciyay suk ra teber. Suk ra veciyay kî jew kalikeki ha romışto. Şiy va:

— «Sılamu eleykum.»

— «Eleykum sılam.» Va:

— «Tı yi sekeni?» Va:

— «Ez aqıl roşeno». Ê va:

— «Tı aqıl roşeni?» Padişaya ravêrt, weziri va: «Vındı kî ez xori aqıl bıgira.» Şı va:

— «Dedo aqılê bîdı mı!» Va:

— «Aqıl bê pere niyo, hirê altuni tı do bîdı ez aqıl tu da».

— «Aha -va- to ri hiri altuni!» Hiri altuni day cı, kal hıma bı kaktê wellı ro, va:

— «İno ê jew sere bo kî sırrê xo kesi ri vano». Wezir fını abırriya:

— «La -va- nu tu aqıl niyo. Fına şêro jewna bıgira». Şı va:

— «Dedo mı ri aqıl bîde». Va:

— «Wini bê pere niyo, bîdı hiri altuni!» Altuni day cı, va:

— «Aha nu zi jew sere bo qewmdê xo ra abırriyo zoybi mêrdıma ra şıro». Va:

— «La nu wina mı zi zanayni, fına ez şêra ey zi bıgiro». Şı va:

— «Dedo mı ri aqıl bîde! Va:

— «Peranê xo bîde!» Hırına altuni day, va:

— «Ha nu jew sere bo, mêrdımo kî mêrdımê hukmati ra bawer

beno». Aqlê kali qediya. Wezir nayo rayır, şı pey ra resa padişay, va:

— «Tu sekerd?» Va:

— «Mı ri hırı hemey wıniya wına va». Ey va:

— «Rınd o»

Fına şı, geyray eger kı dina dı çendi gayray se geyray; çendi menga ra tepya fına ageyray saray, Saray dı kavireki padişay esto. Kavireki sava, werdi yo. Tım û tım çeçekan ra piya şıno bexçe. Weyniyay kı kavır padişay ri bol qedr o, weziri va: «Vındi kı ez tecıbey ni aqlı kero hela rast o, rast niyo». Şıyo, kavirek tırıt û girot ard nımit û şı jewna kavır girot ard qoti cı kerdi, veynda cenêrda xo, va:

— Cenêki bê! Mı kavireki padişay tırıtto ma qotê cı keri xori bori». Cenêkerı:

— «Ey -va- rıdn o? «Cenêkerı ra piya şiv kavır qotê cı kerdi, poste kerdi, goştê cı werdi kerdi, nay ser, werdi. A roji padişay delal dawo venda:

— «Kavirê mı koti vıcıyo se do idam kera, bıyari». Roci, didı, hırı delali venda venda kavır çınıyo, mend. Hırı roci ravêri tepya se weziri ya:

— «Cenêki mıri tasê aw bıya!» Cenêki nêruway. Va:

— «Cenêki tıya ez to ra aw wazena, tı çıçı nêruwena». Cenêki va:

— «Tı çı ri pête xo ani?»

— «Liya -va- mı ri aw bıya!» Werışt çıwey vıst cı. Hama cenêki:

— «Wey -va- to kavirê padişay tırıtto howna tı finenê mı zil! «Hama xo verra da şiy huzırdê padişay va:

— «Padişay mı, Ella umrê to dı bo, kavirê to weziri tırıtto, qotê cı kerdo, werdo zi». Padişay hema derhal hendo kı hêrs bıyo, idamê weziri do vet. Fermanê cı ard. Wezir ame kı şêro saray, senê kı şı se hama tepıştıyo fermanê cı kerdi mıl û va:

— «Ney beri dar dı ki!» Giroti kı çarşı ra berdi darı ver se, hemeyê ahaliyê çarşı arêbıya dıma wuniya, va:

— «Wax wax weziri beni dar dı kenil!» Tanini va:

— «Kavır tırıtto!» Tanini va:

— «Heyf cı ri...» Bırzakên dê weziri esti bi. Weziri bıray xo dew ra qewırna bı, wuca dı hemaley kerd bı, piy cı zi merd yanı bıray zi merd bi. Bırzayanê cı est bi. Va:

— «No çıçı yo wıno?» Va:

— «Weziri benê dar dı kenê!» Va:

— «La wezir dedê mın o, qandê çıçı?» Va:

— «Kavirê padişay tırto!»

— «La -va- kaviri ez şêro padişay ri biga». Şı va:

— «Nika ez kaviri bido nê beno?» Va:

— «Nê!» Va:

— «Dıdını?» Va:

— «Nê!» Va:

— «Desını?» Va:

— «Nê -va- seyınê zi bıgiri nê beno, illa weziri dar dı kerî.»

«Ageyra tesliya cey kewtı Dıma vazda şı kî berdo darı ver, kendri cı zi hazır kerdî. Weziri ri va:

— «Vatişê to esto?» Va:

— «Ney». Va:

«Winiyo se, kendri b'erzi qırri!» Kendir kerd kî weziri qırri se, nê birazay cı xo eşto kendir girot û kerd xo qırri. Cellatka kardi eştı kendir, nê verda. Fına viraşti, fına kendir berdi qırri, fına birazay kerdî xo qırri. Vano: «Vera dedi mı dar dı kerî». Hırı finî eşt xo qırro pusnay welhəsuli. De weziri zi va kî:

— «Padişayo senê bê ifade kesi dar dı keno?» Xeber day padişay va:

— «Rast vato, winiyo se ina bıyarê! «Şiy, wezir û biraza ardê. Padişa weziri ra va:

— «La tıyo se vani? Qey to bêbextiyê kerdî mı, kavirê mı tırt?» Weziri va:

— «Hal mesela wini ya. Mı aqlê kali cerebnay, heme zi rest viciyay. Ey verênı: mı sırrê xo ciniya xo ri va. A zi amey to ri vat. Dıyını: mı bıray xo qewırna, mı xeletey kerdî. Birazay mı ame, mı vera xo eşt merg. Hirênı: mı to ri bol xızmet kerd bi, fına to qedrê mı zey jew kaviri nê zana. To waşt kendir mı qırri kerî, mı dar dı kerî. Mêrdımê hukmati ra bawer bıyayış zi xeletey a. Şiretê kali heme rast viciyay». Padişa poşman bı, va:

— «Ezo to ef bıka, tı fına wezireya mı bıki». Wezir ageyra va:

— «Keso kî qedrê mı henda jew kaviri nê zano, ez rê wezirey nê keno, ez nika ra tepya şiretanê kali tepişeno.»

(— Na çiroka geli dormarey GERGER (Adıyaman'ı ra giyrevä)—)

ZARGOTIN (Stranek Ji Wêşeya Gelêri)

Şerê Xalita

Delana, xweş Delana!
Pêşiya malê me şer e, paşiya malê me ferman a!
Şerê feqirê Êzidiya, sofiyê Mısılmana
Xweştir e ji şerê nêri û berana!
Delana Başo, wa bî şitil
Çend peyayê Mala Zoro li serê girê Qereçêri bûne gutil
Derbekê, dane Hesarê Cibo û Bimbaê Miro, Miçoê mala Şêx Îsa
Ji mala bavê mî qelandin tovê bist û pênc mêrên, rimbîqetil.
Delana Başo, li berê bendê
Mertala destê Hesarê Cibo giran e, kete zendê
Şerê feqirê Êzidiya û sofiyê Mısılmana
Xweştir e ji reqş û govendê.
Lê darê! Delana!
Pêşiyê malê me şer e, tali ferman a!
Pêşiya eşirê Êzidxan çûye tîla Botana.
Delana Başo, bî qırkor e!
Hespê Bîşarê Zoro di meydanê de bore bore.
Derbekê dane li Hesarê Cibo, Bimbaê Miro,
Ji mala bavê mî qelandin tovê bist û pênc şêxê serbîpor e.

Şanek:

Ev stran ji hejmarê 54,15 Gulan 1943 yê
Kovara Hawar'ê, bê guherandin hatîye
wêlgartin.



ZARGOTIN

Lawij

Ezê lı Xana Gosehê fekirim, aliki jê herifti .
Ezê lı dora girê Niskin fekirim, sosın û beybûn tê re bışkıfti
Xwezika wi lawi; du yar lı gundi hebın, êk yar be, ya di dezgırti.
Ezê lı Herekolê fekirim, ne mane kevi.
Dora Kani Ferşıkê nêrım, porjan lê bine dar û devi.
Ezê terka lawikê xwe nadım heta Korkendil bıhele.
Jı mın û lawikê mın re bıbe gakêl û zevi.
Ezê lı Mergûmarê fekirim, mirê hemi besta
Lı Herekolê fekirim, keviyo lê bine mına tılıyê desta
Xweizka mın behr lı bejna bıınd hebiya,
Bıla Xwedê emanetê xwe ji mın bıxwesta.
Ezê lı Arnosê fekirim, mirê hemi çıya
Lehi jê derbine, dıçın ser mülkê Kaxpiya,
Ezê çengülê keleşgöwra xwe bıgrım, bırevınım, bıbım nav male
Qoçebegıya.

Ezê lı Axyolê fekirim, çi çıyaki kezeb e!
Ezê lı Arnosê fekirim, qentarê nêriya lê bine celeb e.
Evinika xelkê dınya alemê hemi lı ser dev û lêvan ın,
Ya mın, rebena Xwedê, tınê ji dıl û kezeb e.
Qulıngo, Xwedê ki ezê nızanım ne tu koçer i, ne holıs i.
Taviki baran dıbarê, piçkê berfê ser çengê te direqısı.
Dema rêka te lı Cızıra Bota bıkevıt,
Tu ji ber mın ve keyfa zeri esmera bıpirsi.
Goyıno, xırabo, çıre dengê te lı mın nayê?
Tu sıbeha dıxwini lı gumbeta Cûdi.
Êvara xwe tavêji beroji Şaravayê
Tu kırasê belgê mishefê wergiri, bawerıya mı lı te nayê.

(HAWAR 15 Gulan 1943, Hejmar 54)



Zazaki Dır Vatey Verinan

ARÊKERDOX : DEWIJ

— A —

- 1 — Altuni ancax serraf şınaseno (şıraseno).
- 2 — Altun, vist serrı woli dı bımano, hewna (rayna) altun o.
- 3 — Aqılo sıvık, baro gran.
- 4 — Aqıl peran reydi nê roçêno.
- 5 — Aqıl pil û şeniki nê porçeno. / Aqıl, qıj û pilleya niyo.
- 6 — Arê bı şeytoni nê viraziya wo.
- 7 — Armeni va: «Lingi (nıngi) pizzi çarneni».
- 8 — Armeni va: «Ez Bısilmane biyo kı ez germiya duyını boro. (bıwero).»
- 9 — Armeni va: «Kê çendı roji betal bıy, kê ehendi roji veşan maneni».
- 10 — Arsız çekerdo ro, fina ar nê kerdo.
- 11 — Aşıkı kelebıyaye, def dırneno. / Aşık kelêba, def dırriya.
- 12 — Aşıkı ri Bexdad gami ca o.
- 13 — Aşıkı ri Bexdad yew gam a.
- 14 — Awa vınderta ra bıters.
- 15 — Aw çıqas goli dı mendi, ehendi buy dekuweno.
- 16 — Axay rê vanê: «To rê imbarık bo», feqiri rê vanê: «To rê koti ra?»
- 17 — Aya kı kê bıkerı (bıki) xwı, yawer (çew) nişno bıkerı (bıko) kê.
- 18 — Aya kı (çı kı) çarey kê dı nuseya, kê veyneno.
- 19 — Ayo kı rayıron dı rakuwo, hewno zi veyneno.
- 20 — Ayo kı zaf bıgeyro, tayi vini keno.
- 21 — Ayre (arê) bı newb a.

— B —

- 1 — Banberbiyaye, kelebıyayi -ra- xıdarêr o.
- 2 — Banderbiyayi bander me kı, tı bander kerdı (tu bander kerd) xwı vir me kı.
- 3 — Banê zûray veşawo, yeweri tıra ina-n nê kerdo.
- 4 — Barê mêrdimdê sêkurri çewt o.
- 5 — Barut û adır yew ca dır nê beni.
- 6 — Belli (Bellu) kulçi ra va: «-Qına tu here ya.», Ay va: «La tı hıma mı ra kewta.» / Belu çift ra kewt va: «-Na qena tu çı hera ya.», va: «-Hera mera, tı zi mı ra kewta.»
- 7 — Beli kulçi (qaf) ra kewt va: «-Qey ez ina pis ra wo?»
- 8 — Beyntarê teresey û camêrdey-dır yew mûy a.
- 9 — Bê ar çekerdo (çeng kerdo) adırı mıyan, vato: «-koli (izimi) terni.»
- 10 — Bı dor, ne bı zor.
- 11 — Bı estorbê şari, kê espar nê beni.
- 12 — Bitirey (qurreyey, payedarey) ga y cıtı ri zi nê manena.
- 13 — Bı xebetê sey Armini, borı sey (hezey) miri.
- 14 — Bızza gerrını, çıme y eyni ra aw wena.
- 15 — Bızı kı qına yay kenıyay, şona nanê şıwani (şani) wena.
- 16 — Bına heramı, tımo çınna. / Bına heromı tımo rıcêna.
- 17 — Bûy (Boy) gulı ri, paşkul telli ri.
- 18 — Bunder bı (Bander bı), mekı.

— C —

- 1 — Cawo kı adır tedır çınno (çını bo), dıy tıra nê vecêno.
- 2 — Cay darban weş beno, cay qalan weş nê beno.
- 3 — Cay camêrdi yan binê ardan o, yan pey caxan o.
- 4 — Cay kotek beno weş, cay nenga nê bene weş.
- 5 — Cıwalo veng xwı sero nê vındeno.
- 6 — Cirane çukıs, kê wayırdê hajda zerrên keno/Cirano mexenet, kê keno wayırê haca zerrêni.

— Ç —

- 1 — Çarey heme çi esto, ê mergi çınıyo.
- 2 — Çarey mêrdimê raşti tım tokerde wo (berz o)

- 3 — Çew (yew) do (dû) y xwı ri nê vano tırş/Çow do-dê xwı ri nê vonu tırş.
- 4 — Çendı (Çındı) aw bir dı mendi, endı bûyını bena.
- 5 — Çı bida desta-n, çı bıgeyra linga-n.
- 6 — Çi gure (gırwe) esto wa-bı-xeyr bo.
- 7 — Çımê veşani, fıraqan dı wo.
- 8 — Çımo pawite, qırş dekuweno.
- 9 — Çıqa ko berz bo, çipa aroşi takûna.
- 10 — Çı ri şeytoni veyneni, çı ri qullowella waneni.
- 11 — Çıwa, cennet ra hameya (vajiyaya)/Kotek cınnet ra vijiyaya.
- 12 — Çıyo kı şı, nino.
- 13 — Çi y teresi weray-ba camêrd (cûmêrd) i.
- 14 — Çi sey (hezey) çıwa zori niyo.
- 15 — Çi sey (zey-hezey) peri niyo.
- 16 — Çiy ımbazi (hembazi), kê çım dı xışn kerêno.
- 17 — Çiy ina dina, ina dina dır maneno.
- 18 — Çıyo kı şı, dıma mekwı.
- 19 — Cuwalo veng, pay nê vındeno.

KURDİ-TIRKİ

— A —

abori	: ekonomî, ekonomik	bêvezani	: sözcük hazinesi
afirandi	: yaratılmış, ken- (ünce oluşturulmuş)	bêna	: sonsuz, ebedî, sınırsız
ajobêna	: süregen, sürekli	bê serûber	: düzensiz, dağınık
akam	: sonuç, etki	bijûn	: sağlıklı
alîkari	: yardım	bijûndar	: sağlıklı
arîzi	: özel	bîkaranin	: kullanma, kullanım
avjenî	: yüzme, yüzüş	bîkar anin	: kullanmak
awarte	: ayırık, istisnai	bînedani	: alt/dip işaret
azin	: yöntem ,metod	bînedanidar	: alt işaretleme, alt işaretlenmiş

— B —

balûpal	: engin	bîşaftin	(bîbîşêfe) : çözümlemek
bej	: kara parçası, kıta	bîyan	: yabancı
berêz	: sayın, muhterem	bli	: uğraşı, meşgul
berpîrsîyar	: sorumlu	bli bûn	: uğraşmak, meşgul olmak
berpîrsîyari	: sorumluluk	boş	: bolluk
bersiv	: yanıt, cevap	boşahi	: kalabalık, izdi-ham
bêje	: sözcük, kelime	bûyer	: olgu

— C —

celeb	: tarz, tür
cıvak	: toplum
cıvaki	: toplumsal, sosyal
cur	: çeşit

— Ç —

çande	: kültür
çandeyi	: kültürel

— D —

daraz	: yargı
derbasok	: geçit, geçiş kıştağı
devok	: ağız, aksan
dıviyahi	: gereksinme, zorunluluk
dirok	: tarih
drúvandın	: benzetme, benzetiş, benzetmek

— E —

egeri	: gerekçe
-------	-----------

— F —

ferma	: resmi
fermo	: buyurun
fıkare	: endişe, kaygı

— G —

gehinek	: evre, aşama
gelavêj	: 21 Ağustos - 22 Eylül arası, bir yıldız

gelér	: halka ilişkin
gelş	: müşkül, sorun
gengaz	: mümkün
gengazi	: imkan, olanak
gerdün	: evren, kainat
geremol	: karmaşa
gıram	: saygı
gıramgır	: saygılı, hürmetkâr
gıring	: önemli, mühim
gıringahi	: önem, ehemmiyet

— H —

hedan	: sabır, dayanç, dayanma
hedar	: istikrar, karar, sükunet bulma
helbest	: şiir
helbestkari	: şiarlık
hemberi	: nisbet etme, rekabet
hevdeng	: eşesli
hevvelati	: yurttaş
heyman	: çağ
hêtûn	: sanayi ocağı, fırını
hılberi	: ün
hılberin	: üretim
hınartın	: postalamak, göndermek
hınermend	: yetenekli, mahir
hoy	: koşul, şart
hoyandın	: koşullandırmak, şartlandırmak

— J —

jêmaye	: miras
jindar	: canlı, yaşayan

— K —

karak	: cevher, maden cevheri
kargeh	: işyeri, fabrika, atölye
karin:	iktidar, güc.
kerane	: çekiç, orta boy çekiç
kesdar	: somut, muşahhas
keşti	: gemi
kevnare	: klasik,

— L —

lêker	: fiil
lê marqilin	: farkına varmak, fark etmek

— M —

makezman	: anadil
mendal	: çocuk
mêjû	: tarih
mêjûyi	: tarihsel
mêtıgneh	: sömürge
mêtınghekar	: sömürgeci
mêtınghekari	: sömürgecilik
mêtınkar	: sömürücü
mêtınkari	: sömürücülük
mıxabin	: yazık, hayfa

— N —

navdêr	: isim, (dilbilgisel)
navgin	: araç, vasıta
neferma	: sivil
nemaze	: özellikle
nıvışt	: nüsha
nıvisani	: yazıma ilişkin

nıviskari	: yazarlık, yazarlı- ğa ilişkin
nir	: boyunduruk
nivro	: güney

— P —

parastın	: korumak
pardari	: ortaklık, müşte- reklik
pele	: ülke
peri	: armağan
peyıtendın	: ispatlamak
pêjn	: duygu, his
pêjnandın	: duymak, his et- mek
pêdandın	: tesbit etmek, sa- bitleştirmek
pênûs	: kalem
pênûsgır	: yazmaya yete- nekli
pêşbir	: erek, hedef
pêvajo	: süreç
pêwar	: lokal, yörel
pırsıyar	: problem, sorun

— Q —

qad	: alan
-----	--------

— R —

raber kırını	: sunuş, sunu
raçandın	: türetmek, türet- me
ragıhandın	: iletmek
rewal	: bıyığı terlememiş delikanlı
rexne	: eleştiri, tenqid
rexnegri	: eleştirel
rêpani	: gözleme, intizar

rik : inat
rikoyi : inatçı
romızı : gündelik, yevmiye

— S —

sından : örs

— T —

têgihan : anlam
têgihandın : anlatmak, kavratmak

têgihıştın : anlamak, kavramak

têrkır : yeterli, yetkin

têvel : farklı

tıqûtenê : yalnız, yalnızca

tika : rica

tip : harf

trali : tembellik

tund : yoğun, kesif

— Ü —

û.h.w.d. : û her weki dı, v.b.

— V —

vatını : görev, ödev, mec-
buriyet

vejandın : yaşatmak, diriltmek

vexwendın : davet etmek

vên : irade

vênmend : iradeli, irade sahibi

— W —

war : alan

weşandın : yayınlamak

weşin : yayınlanmak

wêje : edebiyat

— X —

xunaftın : sindirmek, özümsemek

xunifandın : özümlemek

— Y —

yêmayi : kalıcı

— Z —

zargotın : folklor

zayok : doğurgan

mengi : ideal

mengiwer : idealist

ZAZAKİ (Dımılı) - TIRKİ

— A —

abırrıyayış	: ayrılmak
adê	: o, onu
adır	: ateş
ageyrayış	: dönmek
akerdiş	: açmak
apey	: geri. geriye
aqıtıyayış (atıqıyayış)	: ayrılmak, kop- mak
arê (ayre)	: değirmen
ar kerdış	: pişman olmak, tövbe etmek, utanmak
arê kerdış	: toplamak, der- lemek
arrızı	: özel
arüş (argos)	: tavşan
asan	: kolay
aver bıyayış	: ilerletmek
ay	: o, onlar
aya (a)	: o (dişi için)
ayê	: onlar
ayna	: onlar
ayo	: o (erkek için kullanılır)

— B —

balê	: hiç olmazsa, bari
------	------------------------

bander (bonder)	: alışmak, öğren- mek
bawer bıyayış	: inanmak, gü- venmek
bedelıyayış	: değışmek
belli (bellu)	: palamut
berpırsıyari	: sorumluluk
berrızıyayış	: bağırınak, çıkış- mak
berz	: yüksek, yüce
beyntar	: ara
bıncaran	: temelli, kökten
bıtırey	: şımarıklık, bü- yüklük tasla- mak
bin	: diğer
bic	: kuyu
bêdin	: dinsiz
bê hemd	: istemeden, gay- ri ihtiyari
bêxeyja (bêxeyra)	: olmaksızın, ha- riç, dışında

— C —

ca kerdış	: bulmak, saptat- mak (tesbit)
-----------	-----------------------------------

camêrdek : korkmayan, yi-
ğit, erkekçe dav-
ranan
cax : parmaklık
celeb : hayvan tüccarı
cematki : toplumsal, top-
lumca
cenayış : çalmak (çalgi
çalmak)
cerebnayış : denemek
cı : o, onu, ona
cêdı kerdış : paralamak, pa-
ramparça etmek
dif : nefes
coka (cuwera) : bu nedenle,
bundan ötürü
cus : soy
cusın : asil, soyiu
cüserra : tan vakti, şafak
vakti

— Ç —

çande : kültür
çarnayış : dolaştırmak,
gezdirmek
çekerdış (çeng kerdış) : fırlatmak, at-
mak
çeçal : çakal
çibenok : bilmece
çını birnayış : gözü kesmek
çime : kaynak, göze
çım ver
...dayış : göz koymak, gö-
ze ilişmek
çip : ayak, baldır
çirok : hikaye, öykü
çitale : mensucat, bas-
ma, bez eşya

çukıs (çıkod) : cimri

— D —

dar dı kerdış : asmak, idam et-
mek
darıstan : orman
darober : ağaçlıklı
ded (dat) : amca
dekewtış : içine düşmek
delal dayış : tellal çağirtmak
dem (deme) : zaman
dejnyayış : acıtmak, ağrit-
mak
derdo : ezgi, uzun hava
destan : destan
deşt pey
kerdış (dest
pey kerdanı) : başlamak
deyir : türkü, düğün
havası
deyirê zerrı : aşk türküsü
dım kewtış : peşine düşmek
dirok : tarih
dormare : civar, yöre, et-
raf
durık : ağıt, iş türküsü
dutış (dotış) : sağımak

— E —

ehendına
(endına,
ındına) : bu kadar daha
eksow : şayet, eğer
enawa
(ınawa, wını) : böyle
enê (né) : bunlar
erinayış : satınalmak
erjaye : değerli, degen,
kıymetli

erra kewtiş : yere serilmek
erşawitiş : göndermek
espar : atlı, süvari
estaneke (istanekı) : masal
estor : at
eşnawitiş : duymak, dinlemek
ewro (eyro) : bugün
ey : o
ey : ama, evet, sonra, peki
eyştiş (eştiş) : atmak
eyştiş xenceri : hançerlemek
fek : hançerlemek

— Ê —

ê : onlar, o

— F —

fahm kerdış : anlamak
fesle : ara, fasıla, süre
fetelnayış : kovalamak
fetesiyayış : boğulmak
fina : yine, tekrar
fıraç : tas, tabak, kap
kacak

— G —

ganiyey : canlılık, yaşam
gel : halk
gelêr : halksal, halka ait
germiya : bir çeşit ayran çorbası
duyım : bir çeşit ayran çorbası
ger : uyuz
gerre : şikayet

gêsti : fazla acıkma
gılana ; yine, tekrar
gılangı : bir keresinde
gıran : ağır
gird : büyük
giring : önemli
goşti : kavurma
gure (gırwe) : iş

— H —

hac (hâjı) : ihtiyaç
hagidar : farkında olma, kollama
hasayış (asayış) : görünmek
heb : taie
helbestvan (helbestkar) : şair
henda kı (hındı kı, ehendi kı) : o kadar ki
hergu : her bir
hermele
kerdiş : gürültü patırtı etmek
herr û hera : çok geniş, genişçe
het : yan, taraf
hetani : kadar, dek
hewa : gibi, çeşit
hewna (heyne) : bir kez daha
hewn dıyayış : rüya görmek
hêrs bıyayış : kızmak, sinirlenmek
hêşyar kerdış : uyandırmak, uyarmak
hılber : ürün
hına : daha

hıniyo
(hıniko) : işte, budur, bur-
dadır
hir : bozkır, kıraç
arazi
hunermend : sanatçı, becerik-
li

— İ —

inan : onlar

— J —

jew (yew) : bir

— K —

kavır : kuzu
keftar : 1) çok yaşlı, 2)
sırtlan
kelebiyaye : kudurmuş, huy-
suz, rahatsız e-
den
kemane : eksiklik
kemi : eksik
kemzanaye : az bilen, iyi bil-
meyen
keniyayış : kaşınmak, ka-
zınmak
kişt (kiştı) : taraf, yan
koli (izim) : odun
kovar : dergi
kulçı (cift,
qaf) : palamut yuvası,
kabuğu
kû (ko) : dağ
kûyi : dağlı, vahşi

— L —

la : ama, ya

labrê : ancak, ama, an-
cak
lawayış : havlamak
lılık : ayna
lec : savaş, kavga
lem : ağaç, bodur
ağaçlar

— M —

matmendeki : şaşkınlıkla
ma vajim : örneğin, diyelim
ki
mendox : kalan, kalıcı
meng : ay
meslet bıyayış : musallat olmak
metelok : fıkra
mexenet : cimri
mêşna (mey) : koyun
miclewr
(mijlowr) : karınca
mırdal : leş, hayvan ölü-
sü
mıyan : ara
miraswer : mirasyedi
musayış : öğrenmek, alış-
mak

— N —

nayış rayır : yola koyulmak,
yola düşmek
nebaş : kötü
neng (leng) : küfür, sövgü
netewe : ulus
ney : bu, bunu
nêweş : hasta
nimac
(nimaj) : sabah, namaz
nımitiş
(ınıtiş) : saklamak
nıwıskar : yazar

nıwıŝte (nuŝte)	: yazı, yazılı, muska
nıwıŝtox (nuŝtox)	: yazar, yazan
ni	: bu
nusxa	: nüsha

— O —

oqyanos	: okyanus
ownıyayıŝ (wunıyayıŝ, wınıyayıŝ)	: bakmak
oxmo	: meğer

— P —

palax	: sonbaharda yer- de kalan yaprak veya ekin biri- kintileri
pardari	: pay, görev
pars	: pars
paŝkıl	: tekme
paŝti dayıŝ ...	: destek olmak
pawıtıŝ	: korumak, bekle- mek
pawıteyoxey	: bekçilik
payedarey	: kibirlilik, üstün- lük taslamak
paye kerdıŝ	: kurumluluk, üs- tünlük taslamak
pay (pay ra)	
vındertıŝ	: ayakta durmak
pey	: sonra, arka
peyenı (peynı)	: son, sonunda
peymende	: miras
pênûs	: kalem

pêser kerdıŝ	: biriktirmek, derlemek
pırnık	: burun
pırtúk	: kitap
piyor (pêro)	: hep, hepsi
pıley	: büyüklük
piya	: birlikte
pızze	: karın

— Q —

qalayıŝ	: melemek
qandê	: için, bu nedenle
qeçek (qıcek, qıj)	: çocuk
qedr	: değer, kıymet
qelew	: şişman, dolgun, gelişkin
qe nébo	: hiç olmazsa
qewırnayıŝ (qowrnayıŝ)	: kovmak
qıneste	: kalça
qırrı (qırrıkı)	: boğaz
qıjji	: bağırtı, haykırıŝ
qırri	: bağırtı, haykırıŝ
qoçi kerdıŝ	: boynuzlamak
qoti cı kerdıŝ	: kesmek, kafası- nı kesmek
qurreyey	: büyüklük tasla- mak

— R —

rakewtıŝ	: yatmak, uzan- mak
ramıtıŝ	: sürmek
rast vıcıyayıŝ	: doğru çıkmak
raŝte	: meydan, düzlük
ray kerdıŝ	: yollamak, gön- dermek

ravêrtiş (vêretiş) : geçmek
rayna : yine, tekrar
recefiyayiş : titremek
remayiş : kaçmak
resayiş : yetişmek, olgunlaşmak
rexne : eleştiri
reydı (reyra) : ile, birlikte
rêz kerdış : dizmek, sıralamak

ricıyayiş (rijeiyiş) : yıkılmak
rikêf kerdış
ser : üzerine hücum etmek, üstüne vürümek
rıştış : göndermek, yollamak
rojname : gazete
roşeyiş (roşıyayiş) : satılmak
roşn : aydınlık, ışıklı
ruwayiş : gitmek

— S —

sanayi : sanayi, endüstri
sava (sabe) : yeni doğan kuzu v.s.
sazuman : düzen
senê : nasıl
serebirnayiş : hayvan kesmek
sererast : düzenli, yolunda
ser nayiş (nayiş ser) : pişirmek, kaynatmak, üstüne koymak
seser : yüzyıl
sew (zow) : eğer

sey (zey, hezey) : gibi, kadar
sékur : yetim, öksüz
sıstek : gevşek
siud : şans
sowkî (zow, eksow) : şayet, eğer

— Ş —

şarıstan : kent, şehir
şatıyayiş : zayıflamak, bozulmak
şenk (qij, qit, werdikek) : küçük
şerm : ayıp, utanma
şidênayiş : sıkıştırmak, sağlamlaştırmak
şınasnayiş (şırasnayiş) : tanımak
şınayiş (şıyayiş) : yapabilmek
şiret : öğüt
şuxılınayiş : kullanmak, çalıştırmak

— T —

tadayox : çeviren, çevirmen
ta kewtış : takılmak
tayi (tani) : bazı, biraz
tamıjıyayiş : tadını almak, tadına alışmak
teba (towa) : şey, nesne
telli (tellu) : diken
tenya (tena) : yalnız
tesli kewtış (kewtışê tesli) : ümidi kesilmek, vaz geçmek

tepya (tepa, apey) : geri
tepiştış : tutmak, yakalamak
tê fek vıstış (eyştış tê fek) : hepsini birden dövmek, tümüne vurmak
têj : keskin
tê mıyan
kewtiş : birbirine girmek, birbirine karışmak
têşanayış : sallamak, silkmek
tikê : azıcık, biraz
tikûtena : yapayalnız, yalnızca
tım û tım : sürekli
tırıtış (tırawıtış) : hırsızlık yapmak, çalmak
tiro cenayış (tiro kerdış) : sokmak, batırmak
tik : rica
titik : en uc, en yüksek yer
to kerdış : sıvamak (paçayı sıvama)
tujar (têjir) : tüccar

— Ü —

umar : sayı

— V —

vajeyiş (vajiyayış) : söylenmek
vatey verinan : atasözleri
vendayış

(veyndayış) : çağırmak
veng : ses
venğ : boş
vera şiyayış : karşılamak, önüne doğru gitmek
ver kewtiş : önüne düşmek
ver kewtiş : üzümek
verê verkan : en önce, ilkin, her şeyden evvel
vero ameyiş : karşı gelmek, karşı çıkmak, yanısıra gitmek
verradaye : boşanmış, boşta gezen, salınmış, serseri
ver resayış : yanına varmak
veşayış (veyşayış) : yanmak
vêr : geçit
vilêşnayış : eritmek, ovmak
vindi (vin) : kayıp

— W —

wa : olsun
wayır : sahip çıkmak
veciyayış :
wedarıyayış : ortadan kaybolmak, ortadan yok olmak
weqefıyaye : çok korkan, korkak
weray : layık
werdi diyayış (wirdêk diyayış) : küçük görmek
werdi kerdış : kesmek, ufak ufak hale getirmek

weriştış : (birisiyle) otu-
 ronıştış : rup kalkmak
 werrek ardiş : imrenmek
 wesefiyeyiş : övünmek
 weşanayiş : savurmak, sal-
 lamak
 weş bıyayiş : iyileşmek
 weynıyayiş
 (ownıyayiş) : bakmak
 wêje : edebiyat
 wını
 (ınawa) : öyle
 wır : her
 wuca (ayca,
 owra) : orası, ora

— X —

xebat : çalışma, çaba,
 mücadele
 xelesıyayiş : kurtulmak
 xeletey : yanlışlık, hata
 xıdar : yaman, şiddetli
 xırab : kötü
 xışın (xışn) : büyük
 xwı ser deh : başından sav-

kerdiş : mak, atlatmak
 wxı tê bına
 kerdiş (wxı
 yewbına bın
 ra kerdiş) : birbirine sokul-
 mak
 wxı ver
 şanayiş : önüne katmak,
 yüklenmek (kat
 lanmak)

— Y —

ya : o (dişi için)
 yêni (ini, jini) : onlar, onları

— Z —

zerweş : mutlu, neşesi
 yerinde olan
 zerba xwı : gönlünce
 zerrên : altından
 zey : kadar, gibi
 zıdi : güç, takat
 zorkani : zorla
 zoybi (sowbi) : başka
 zûrker (zûra) : yalancı

İçindekiler/contents

Sunu 3	Introduction 3
Çağrı / Serxas ARDA 7	Invitation / By Serxas ARDA ... 7
Bu Dili Nereden Getirdin? (Anı) / Flit TOTANİ 9	Where did you find this language? (A reminiscence) / Flit TOTANİ 9
Rojen BARNAS'tan şiirler:	Poems by Rojen BARNAS:
● Ben Dört Yaşında Bir Çocuğum Amca 15	● I'm a child four years old 15
● Nasihatçı Molla 17	● Adviser Molla 17
● Yaşantı 20	● Living 20
● Gülümse 21	● Smile 21
Nereye Gidiyorlar (Öykü) / M. ŞEFİQ 23	Where do they go (A Story) / M. ŞEFİQ 23
Zaman Bilir, Altın Bilir, Zor Bilir (Öykü) / Feridun SALAR 27	Time Knows, Gold Knows, Force Knows (A Story) / Feridun SALAR 27
Mem RONGA'dan şiirler:	Poems by Mem RONGA:
● Bahar Önce Şiirlere Gelir 34	● Spring begins with flowers 34
● Kapıname 35	● On the doors 35
Çeviri	Translation
● Onlar (Şiir) / Nazım HİKMET 36	● They (Poem) / Nazım HİKMET 36
● Şarkılarımız (Şiir) / Nazım HİKMET 38	● Our songs (Poem) / Nazım HİKMET 38
● Koyun Masalı (Öykü) / Sabahattin ALİ 39	● A tale on sheeps (A Story) / By Sabahattin ALİ 39
Folklor	Folklore
● Eskilerin Öğütleri (Halk Öyküsü) 43	● Ancestors advices (folk's tale) 43
● Xalit'ların Kavgası (Ağıt) 46	● Xalit's battle (a wailing poem) 46
● Ağıt 47	● A wailing poem 47
● Zazaca Atasözleri 49	● Proverbs in Zaza dialect 49
Sözlük 52	Glossary 52

www.arsivakurd.com

www.arsivakurd.com